

## Xwe nekuje!

Sedemên xwekuştina jinan li her derê cîhanê cuda ye. Li hin cihan jin ji ber tundiya mêr û malbatê yan tên kuştin an jî xwe dikujin. Li hin cihan jin ji ber sedemên aboriyê dawî li jiyana xwe tînin, li hin cihan jin ji ber destdirêjiya li hemberî wê xwe dikujin û hwd... RÛPEL - 2



## Serdana Spano

Serokê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê Robert Spano di 3 û 4'ê îlonê de serdana Tirkiyeyê kir. Gelek derdoran bi awayekî mafdar ev serdan rexne kir. Îzahata Spano ya li dijî van rexneyan jî wê meselaya ku dibêje; lêborîna wî ji qebeheta wî xerabtir bû... *Ramazan Olçen* / R.3




## Berfwerîn

Berfwerîn, tê wateya "ê/a ku berfê tîne". Rênas Jiyan, peyveke ku bixwe çêkiriye kiriye navê pirtûka xwe. Pirtûk ji 8 beş û 20 helbestan pêk tê. Nivîskar cardin mijarên sosyolojîk û mîtolojîk xistiye navenda helbestên xwe... *Şêrko Janzêm* / R.5

Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

14-20 Îlon 2020
Hejmar:39
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

## Nexweşiyek bi navê anakronîzmê

Hebûna kurdan helbet di roja roj de, li serdema me ya dêrîn û zêrîn, wek Uçayîşravasê mîrê hespan xwedî gewdeyeke heft ser bû; bes ji wan seran îro hema bêje sê man. Li ser gewdeyê me wek temsîla hebûna me sê ser hene: çand, ziman û dîrok. Yek ji wan ji yên din nabe. Lewre divê em şûrê destên anakronîstan ji wan bistînin da ku yekê ji wan bi/bê zanebûn jêneke, an jî ew serên me nebin qurbaniyên anakronîzmê... *Samî Hêzil* - R.5

# Rapora binpêkirinên mafên ziman tê amadekirin

Endamê Lijneya Şêwrê ya Tora Ziman û Çanda Kurdî Omer Fîdan pirsên rojnameya me bersivandin û wiha got: "Niha torê ev jî daye ber xwe ku rewşa binpêkirinên mafê ziman û wekî rapor binivîse û raporên xwe bi Yekitiya Ewropayê re par vebike. Heta niha raporeke ku ji 50 rûpelî pêk tê hatiye amadekirin. Her wiha niha ez li ser anketekê dixebitim ku di dema civîna torê de wekî rapirsîn hatibû amadekirin. Raporê maseya perwerdeyê li ser bandora pendamiyê û raporeke din jî niha li ber destê min e ku heta mehekê ev her du raporên dawî jî dê biqedin. Ji bilî van dê sê raporên din jî werin amadekirin. Tor hewl dide ku van kêşe û arîşeyên heyî ne tenê di nav kurdan de lê dixwaze wan ragihîne ewropa û raya giştî ya navnetewî jî..." *Hevpeyvîn Rizoyê Xerzî* / RÛPEL - 4



# Wijdan dişewitin



Li Botanê li deverên ku leşkerên tirk derdikevin operasyonê daristan tên şewitandin. Nemaze li çiyayê Cûdî bi mehan e şewat didome. Şewata ku li gundên Gundikê Remo, Gundikê Spîndarûkê, Cifanê, Nevaqara û Avgamasya rû dabû berdewam dike. Li herêmê şewatek vemire, yeke din dest pê dike. Rayedarên dewletê nahêlin gel şewatê vemirîne û parlamenterê HDP'ê yê Şirnexê li dijî şewata daristanan dest bi çalakiyê kir û gel jî piştgiriyê dide çalakiyê. Gelê herêmê ragihand ku ya dişewite daristan nîne, wijdana mirovahiyê ye... RÛPEL - 3

## Belgfîlma bêedaletiyê


Fragmana belgefîlma bi navê "Mamoste" yê çîroka sê mamosteyên bi Biryara di Hukmê Qanûnê de (KHK) ji karên xwe hatin avêtin vedibêje, hat belavikirin. Derhêneriya belgefîlmê M.Salih Çelîk û Kemal Hazanay kiriye û çêkerê belgefîlmê jî li ser navê Tor Fîlmê Ferat Kevir e. Çêkerê belgefîlmê Ferat Kevir diyar dike ku piştî hewldana darbeyê, gelek hevalên wan bi awayekî bêhiqûq ji karên xwe hatin avêtin... RÛPEL - 11

## Aramê 7 pirtûkên kurdî çap kirin

Weşaxaneya Aramê, di şert û mercên giran ên pêvajoya pandemiyê de jî kar û xebatên xwe yên weşangeriyê didomîne. Aramê yek jê tirkî 7 jê kurdî bi giştî 8 pirtûkên nû çap kirin û ev pirtûk li pirtûkfiroşan derketin ber destên xwendevanan. Her wiha weşanxaneyê bi boneya salvegera jidayikbûna Apê Mûsa ya 100'emîn, bi bangewaziya rojnameger Huseyîn Aykol bi navê 'Apê Mûsa 100 Salî ye' pirtûkek çap kir... RÛPEL - 7

## Şerê kurdan ê navxweyî xwekuştina siyasî ye

Siyasetmedar Mihemed Emîn Pêncwênî têkildarî serdana Nêçîrvan Barzanî ya Tirkiyeyê axivî û got ku Barzanî nameyek tund a Macron gihandiye Erdogan. Pêncwênî diyar kir ku dema şerê kurd û kurd rû bide, wê bibe xwekuştina siyasî. Wê zirar bide hemû aliyên kurdî... R.7



## Hunerê resimî de cinî

Hunero ke tewr zêde cinî bêpar û bêname ameya verdayene resim o. Cinî, no warî de çinbîyaye ameya hesibnayene. La pêwa pêro nê çîyan reyna zî fek nê hunerî ra vera nêdaya û bîyayîşê xo ramojna ya. Eke ma destpêkê resimî de zî resimê şikeftan ra bigîrê dest; no huner heta seserra 10ine bi îmzayê camêrdan aseno. Her çend cinsê viraştişê xêzê şikeftan nêro zanayene zî semedo ke babeta înan; sehneyê seyîdwanî, şer, pêrodayîş û ûsn bîyê viraştişê ci camêrdan... *Gulçîn Adar* / R- 11



## Lê Amedê Amedê...

Çaxa ku Apê Mûsa li strana Lê Amedê Amedê, guhdarî dike û mîna derwêşê erbana wî di dest de, zarokê di hembêza xwe de bilind dike, hindik dimîne ku baskên wî çêbibin. Apê Mûsa kefenê wî tim pê re bû... *Seyîdxan Anter* / RÛPEL - 8

# Li dijî mirovên spî berxwedana jina reşik!

Navenda Nûçeyan

Li ser rûyê erdê tu civak tune ye ku ji pergala serdestan zirarê nedîtibe. Hin civak ji ber zimanê xwe, hin civak ji ber ola xwe, hin civak ji ber rengê çermê xwe rastî zextên desthilatdariyê hatine. Li dijî zext û êrîşên desthilatdaran her tim berxwedana civakan jî hebûye û pêşengên van berxwedanan jî bi gelemperî jin bûne.

Ger em bala xwe bidinê jin di her bûyera civakî ku mohra xwe li dîrokê xistiye û bûne sedema guhertina gelek tiştan. Jin bi deng, tevger, sekn û heta bi bêdengiya xwe bûne pêşengên guhertina gelek tiştên civakî û pergala desthilatdariya mêr.

Yek ji civaka ku rastî her cureyên zext û êrîşên pergalê hatiye reşik in. Reşik ji ber rengê çermê xwe her tim rastî êrîşan hatine û wekî kole hatine dîtin. Mirovên reşik ên rastî her cure êrîşên pergalê hatine di her demê de li hemberî vê pergalê serî hil dane. Tevî hemû komkujî û qetlîamên li hemberî wan, ji têkoşîna xwe ya azadiyê paşde gav neavêtine. Civaka reşik her tim bi pêşengiya mirovekên reşik serî hil dane û heta gihîştina mafên xwe yên azadiyê li ber xwe dane.

Yek ji van pêşengan jî parêzvanê mafê mirovan a Amerîkayê jina bi navê Rosa Louise Parks e. Rosa Louise Parks di 4'ê sibata 1913'yan de li eyaleta Alabama Amerîkayê tê dinê. Di sala 1943'yan de tev li tevgera mafê hemwelatiyê ya Amerîkayê dibe û di sala 1955'an de li eyaleta Alabamayê li dijî cihêkariyê ya li hemberî reşikan derdikeve û dibe pêşenga tevgerên wê demê.

> Ger jin bixwaze dikare bi tena serê xwe, bi gotinekê bibe sedema guhertina gelek tiştan û dikare civaka ku ji aliyê pergalê ve tê eciqandin rake ser pêyan. Ger jin bixwaze dikare bi sekna xwe bibe pêşenga civakê

Di wan salan de li eyaletên başûr ên Amerîkayê mirovên reşik û spî ji deriyên cuda siwarê otobusan dibûn û li cihê ku ji bo wan hatibûn veqetandin rûdiniştin. Rosa Parks rojek li Montgomeryê siwarê otobusê dibe. Li otobusa lê siwar dibe miroveke çerm spî ji bo rûniştinê cih nabîne û li beşa ji bo çerm reşikan hatiye veqedandin ji Rosa Parks dixwaze ji cihê xwe rabe û bide wî. Ajokar jî ji bo rabûnê hişyarî dide lê Parks ji cihê xwe ranabe. Ji ber vê yekê Parks tê girtin û wê dikin girtîgehê.

Di wan salan de li eyaletên başûr di otobusan de dema mirovên çerm spî cih nedîtibûna, dikaribûn mirovên çerm reşikan ji cihê wan rakin û li cihê çerm reşikan rûnin. Mirovên çerm reşik jî ger li dawiyê cih hebûna diçûn li wir rûdiniştin, an li ser piyan diman an jî peya dibûn li benda otobuseke diman.



**Çalakiyên reşikan**

Piştî girtina Parksê mirovên reşik zêdetirê salekê ji bo protestokirina cihêkariya li dijî reşikan li otobusan siwar nebûn û bi meşê diçûn karên xwe û her derê. Ev çalakiya reşikan bû sedem ku şîrketên otobusan bên ber îflasê. Çalakiyên protestoyî piştî salekê encam da û Dadgeha Federal a Amerîkayê dawî li vê pêkanînên otobûsan anî. Rosa Parks li Alabamayê ji ber bi tacîza çerm spiyan re rû bi rû ma ji neçarî ji wê eyaletê koçî bakurê Amerîkayê kir.

**Sembola berxwedanê**

Di heman dîrokê de waliyê Alabamayê ji bo mirovên reşik neçîn zanîngehan çi ji destê wî hat kir. Ev hewldanên walî bûn sedema bûyerên mezin ên reşikan. Tevgera ku ji aliyê Martin Luther ve dihat birêvebirin di sala 1964'an de bi derxistina qanûnekê gihîşt encamê. Û Rosa Parks jî bû sembola vê berxwedanê.

Rosa Parks di sala 1999'an de ji aliyê kovara Time ve wek parêzvana mafê mirovan a sedsala 20'emîn hat hilbijartin. Parks di sala 1996'an de layiqê Madalyaya




Azadiyê ya Serokatiyê hat dîtin û di destpêka sala 1999'an de jî Madalyaya Zêrîn a Kongreyê qezenc kir û vê xelata xwe jî ji destê Bill Clinton girt. Roza ya heta dawiya jiyana xwe li dijî neheqiyan li ber xwe da, 24'ê cotmeha 2005'an canê xwe ji dest da.

**Ger jin li ber xwe bidin**

Mirov di mînaka Rosa Parks de jî dibîne, ger jin bixwaze dikare bi tena serê xwe, bi gotinekê jî bibe sedema guhertina gelek tiştan û dikare civaka ji aliyê pergalê ve tê eciqandin rake ser piyan. Jin bixwazin dikarin bi sekna xwe bibin pêşenga tevgera herî mezin a civakî. Divê jin tenê bixwazin û biryarê bidin, wê demê tu hêz û pergal nikare li hemberî jinan bisekine. Bi xwe bawer bin bese.

# Xwe nekuje birêxistin bike

Navenda Nûçeyan

Ji Kurdistanê û Rojhilata Navîn heta li tevahiya cîhanê, li her derê jin ji aliyê pergala mêr ve, yan tên qetilkirin an jî wisa dibe ku jin bi destê xwe dawî li jiyana xwe bînin.

Sedemên xwekuştina jinan li her derê cîhanê cuda ye. Li hin cihan jin ji ber tundiya mêr û malbatê yan tên kuştin an jî ew xwe dikujin; li hin cihan jin ji ber sedemên aboriyê dawî li jiyana xwe tînin; li hin cihan jin ji ber destdirêjiya li wan xwe dikujin û hwd. Mirov dikare mînakên bi vî rengî zêde bike lê di bin sedema hemû kuştin û xwekuştinan de zihniyeta desthilatdar a mêr heye.



Pergala heyî bi hemû hêza xwe piştgirî dide mêran ku li her qada jiyanê; ji malê heta cihên kar û kolanan li derê zextê li jinan dikin. Gelemperiya jinan jî rêya xelasiya ji pergala mêr di xwekuştinê de dibîne.

**Salane nêzî 80 hezar kes…**

Der barê bûyerên xwekuştinê de Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) salek berê raporek parve kiribû û ragihandibû ku li cîhanê di her 40 saniyeyan de kesek xwe dikuje û salane nêzî 80 hezar kes xwe dikujin. Li gorî rapora WHO'yê hejmarên kesên xwe dikujin ji hejmara qurbaniyên şer û bûyerên kuştinê zêdetir e.

Her çiqas rapora WHO'yê raporeke giştî be jî li cîhanê herî zêde jin dawî li jiyana xwe tînin. Çimkî herî zêde jin ji pergala desthilatdar zirarê dibînin û jixwe pergala heyî hebûna xwe li ser tunebûna jinê û civakê avakiriye.

**Hemleya li dijî xwekuştinê!**

Têkildarî mijara xwekuştina jinan û bi boneya 10'ê Îlonê Roja Pêşîlêgirtina Xwekuştinê ya Cîhanê ku di sala 2003'yan de WHO'yê tevî Komeleya Navneteweyî ragihandibû, Rêxistina Sara û Meclisa Jinan a Sûriyeyê daxuyaneke nivîskî dabûn. Heta Rêxistina Sara li dijî tundî, kuştin û xwekuştina jinan hemleyek dabû destpêkirin.

**Çareserî çi ye?**

Çareseriya xwekuştina jinan dîsa jin bixwe ne. Divê hemû saziyên jinan ên cîhanê li dijî bûyerên bi vî rengî hêza xwe bikin yek; derbarê mijara xwekuştinê û armanca pergala mêr a kuştina jinan de semîneran bidin, atolyeyan vekin, mal bi mal, tax bi tax, bajar bi bajar heta welat bi welat bigerin, xwe bigihînin her jinê û wan perwerde û bi rêxistin bikin. Ne tenê jinan pê re girêdayî civakê jî perwerde û bi rêxistin bikin.

Divê neyê jibîrkirin, çawa ev pergala heyî bi gelemperî hebûna xwe di bêdengkirina jinan de dibîne, divê jin û civak jî hebûna xwe û têkbirina pergalê di perwerde û xwebirêxistinkirinê bibînin.




# Ne fen e ev çi ben e

**Rayedaran weke her bûyerên nijadperest ji bo êrîşa nijadperest a li Sakaryayê ya li hemberî karkerên kurd ket nav hewldanên nixumandinê. Nixumandina rayedaran careke din biwêja ‘ne fen e ev çi ben e’ anî hişê mirov**

Navenda Nûçeyan

Zihniyeta nijadperest ku kurdan ji xwe re weke neyar dibîne, di her firsendê de êrîş dibe ser kurdan. Tu karkerekî ji rêzê bî û ji bilî nanê te haya te ji tiştekî tun be jî li bajarên wan tu dibî hedef û êrîşên nijadperestan li te tên kirin. Li bajarê Sakaryayê karkerên kurd ên ji bo berhevkirina findiqan çûbûn bajêr, bi vê aqûbetê re rû bi rû man. Xwediyên findiqan ji ber kurdbûna wan karker biçûk xistin û bi awayekî tund êrîş birin ser wan.

Karkeran bi zorê canê xwe xelas kir û vegeriyan mala xwe ya li Şemrexa Mêrdînê. Li gel ku dîmenên kêliya êrîşa li hemberî karkeran bi çapameniyê re hatin parvekirin jî Walîtiya Sakaryayê wekî bûyerên bi vî rengî yên beriya niha ket nav hewldanên nixumandinê. Walî angaşt kir ku êrîşeke bi vî rengî li bajarê wî li hemberî karkerên kurd pêk nehatiye.

**Hewldanên nixumandinê**

Bi heman rengî parlamenter û rayedarên desthilatê yên li bajêr jî piştgiriya Walîtiya Sakaryayê kirin û angaşt kirin ku li bajarê wan êrîşên bi vî rengî pêk nayên. Piştre ji ber ku bûyer bû sedema bertekên mezin û gelek derdorên cuda hem êrîş hem jî helwesta dewletê ya ji bo êrîşê şermezar kirin, waliyê Sakaryayê li karkeran geriya û got ku êrîşkar binçav kirine.

Piştî ku karker vegeriyan gundê xwe Kelekê, destpêkê çûn qereqola cendirmeyan a navçeyê û bi gotinên xwe Walîtiya Sakaryayê, parlamenter û rayedarên desthilatê derewandin. Bi armanca ku pêşî li piştevaniya ji bo gundiyan bê girtin gundê Kelekê hat dorpêçkirin û li gel ku tu pêketiyên vîrûsa koronayê li gund tunebûn jî bi hinceta vîrûsê gund kirin qarantînayê. Heta çend rojan nehat hiştin tu kes derbasî gund bibe û bi karkeran re hevdîtin bike.

**Astengkirinên li gund**

Heyeta ji HDP’ê û Partiyên Tifaqa Kurdistanê pêk dihat, li gel astengiyan jî hewl da biçe gund û bi karkeran re hevdîtin bike. Li têketina gund leşkeran pêşî li wan girt û nehişt ku derbasî nav gund bibin. Heyetê li vir bertek nîşanî leşkeran da û bi daxuyaniyekê nijadperestiya li hemberî karkerên kurd şermezar kir.

Hevserokên HDP’ê Mîthat Sancar û Serokê Giştî yê CHP’ê Kemal Kiliçdaroglû li karkerên êrîş li wan hatibû kirin geriyan û piştgiriya xwe ya ji bo wan aşkera kirin. Rexmî vê yekê rastiya li holê jî tu rayedarekî desthilatê li karkeran negeriya û êrîşa li hemberî wan şermezar nekir.

**Heman parastin!**

Êrîşa nijadperest li ser medyaya civakî jî bi rojan hat nirxandin û bi sed hezaran kes êrîş şîrove kir û bertekên xwe li dijî nijadperestiyê nîşan dan. Wezareta karên hundir, der barê van bertekên zêde de daxuyaniyeke bi sosret da û angaşt kir ku êrîş tê berovajîkirin.

Qarantînkirina gundê Kelekê yê karkerên kurd, her tiştî raxist holê. Heke êrîş pêk nehatibe gelo çima gund tê qarantînakirin? Erê nav qarantîna bû lê di rastiyê de gund hat dorpêçkirin. Bi rojan destûr nehat dayîn ku ne kes biçe gund ne jî gundî ji gundê xwe derkevin. Ev jî biwêja ‘ne fen e ev çi ben e’ tîne hişê mirov.

# Şewata daristanan dilê herkesî naşewitîne!

Navenda Nûçeyan

Operasyonên leşkerî yên di meha hezîranê de hatibûn zêdekirin, bênavber didomin û her carê li bajarekî bakurê Kurdistanê operasyonên nû tên li darxistin. Di nav hefteyê de li bajarê Wanê bi beşdariya cerdevan û leşkeran operasyoneke mezin hat destpêkirin. Di operasyonê de leşker li devereke berfireh a herêmê belav bûn û lêgerîn pêk anîn.

Dîsa li Bedlîsê jî operasyonek hat destpêkirin. Ji bo operasyonê ji aliyê Walîtiya Bedlîsê ve li hejmarek gund qedexeya derketina derve hat ragihandin. Piştî qedexeyê leşker û cerdevan bi maşîneyên leşkerî ketin çoltera Bedlîsê û dest bi operasyonê kirin. Ji ber operasyonê qedexeya derketina derve bi rojan berdewam kir û gundiyên li herêma operasyonê gelek zehmetî kişandin.

**Şewata li Cûdî**

Her wiha operasyonên ku demek beriya niha li Botanê jî hatibûn despêkirin berdewam kirin. Di operasyonan de li gelek deverên Çiyayê Cûdî agir hatin derxistin û beşeke mezin a daristanên li çiya şewitîn. Şewata daristanên li herêma operasyonan bi rojan berdewamkirin û bi hinceta ewlehiyê destûr nehat dayîn ku mirovên li herêmê şewata li Cûdî vemirînin.

Şewat li bakurê Kurdistanê bû sedema bertekên mezin. Li ser medyaya civakî bi deh hezaran kesan bertek nîşanî şewata li daristanên Cûdî da û daxwaz kirin ku destûr bê dayîn da ku şewat bê vemirandin. Li gel van bertekan jî şewat nehat vemirandin berovajî li hin deverên din ên Cûdî jî hat derxistin. Ji ber vê sedemê HDP’a Şirnexê der barê mijarê de daxuyanî da û ragihand ku şewat ji aliyê leşkeran ve tê derxistin û dîsa bi astengiya leşkeran destûr nayê dayîn ku şewat bê vemirandin.

**Daxwaza şewatê kirin!**

Piştî vê daxuyaniyê Parlamenterê HDP’ê yê Şirnexê Hasan Ozguneş, li ber avahiya HDP’ê ya bajêr dest bi çalakiya rûniştinê kir. Çalakiya Ozguneş 3 rojan berdewam kir û bû sedem ku şewata daristanên li Cûdî bêtir bê bihîstin. Ev jî rastî nerazîbûna AKP’iyên li herêmê hat. Komeke jinên AKP’î bi piştgiriya polîsan çû ber avahiya HDP’ê û bi awayekî sosret bertek nîşanî çalakiya Ozguneş dan. Bi gotineke din xwestin ku Ozguneş dev ji çalakiya xwe berde û şewata li Cûdî bê bidome. Ozguneş, bertek nîşanî polîsan da û got ku li bajêr bi destê wan provakasyon tê kirin.

## ESP û TJA’yî binçav kirin

Di operasyonan de endam û rêveberên Partiya Sosyalîstên Bindest (ESP) û aktîvîstên Tevgera Jinên Azad (TJA) di hedefe de bûn. Destpêkê li dijî endam û rêveberên ESP’ê operasyoneke siyasî pêk hat. Polîsan bi ser malên ESP’iyan de girt û Hevberdevkê Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) Sedat Şenoglû jî di nav de 15 kes binçav kirin. Di heman rojê de ESP, HDK û HDP li dijî operasyonê derketin û li gelek navendan çalakiyên şermezarkirinê li dar xistin. Operasyoneke siyasî li dijî aktîvîstên TJA’yê jî hat kirin. Operasyona li dijî aktîvîstên TJA’yê li Amedê pêk hat û polîsan aktîvîstên bi navê Derya Arslan, Ayşe Ekîmcî û Derya Moray binçav kirin. Piştî binçavkirina 3 rojan her sê aktîvîst jî hatin berdan. *AMED*




*“Hiqûq fahîşeyê desthiladariyê ye!”*
*Mihail Bakunîn*



Ramazan Olçen

## Mehkemeya wijdanê û serdana Spano

Serokê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê Robert Spano di navbera 3 û 4’ê îlonê de serdana Tirkiyeyê kir. Gelek derdoran bi awayekî mafdar ev serdan rexne kir. Îzahata Spano ya li dijî van rexneyan jî wê meselaya ku dibêje; lêborîna wî ji qebeheta wî xerabtir bû anî bîra me. Îdiaya Spano ev e; ji bo wergirtina doktoraya fahrî ya ji Zanîngeha Stenbolê ew çûye Tirkiyeyê. Zanîngeha ku behsa wê tê kirin jî ji aliyê serokomarê tirk Erdogan ve pûş kutane eyarê wê. Tê de ne akademîsyen ne jî xwendekar nehatine hiştin. Îdiaya Spano pêçavek e ku hewl dide ser rastiyê bigire lê herçî rastî ye di tarîtiyê de jî namîne.

Ji dema ku Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê ji Tirkiyeyê serlêdanên şexsî qebûl dike vir ve ango ji sala 1990’î ve yek ji wan welatên ku vê dadgehê herî zêde mijûl kiriye. Piştî Rûsyayê welatê ku herî zêde mafên ku di Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê de bin pê kiriye dewleta tirk e. Dadgeha ku îro roj Spano serokatiya wê jî dike ji bo dosyayên ji Tirkiyeyê tên mesaiyeke zêde dike. Dema em li biryarên wê yên di demên dawîn de hem jî li biryarên wê yên der barê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de dinêrin, em dibînin ku encam li gorî konjonktura siyasî derketine. Dadgeha Spano nîşan da ku ew li barey dozên ku di encamê de wê li Tirkiyeyê ji bo demokrasiyê hevrûbûnek çêbibe, biryarên esasê nade. Esasa meselê paşve dixe.

Îcar heke em ji esasê ve bi meselê dakevin; Dadgeha Mafên Mirovan weke îluzyonekê tevî gelê kurd, gelên ku bi hêviya edaletê çûn ber derê wê, egle û mijûl kir. Wê bi hostatiyeke mezin ev peyam da; erê rast e, dewletê zilm li we kir, îşkence kir, gundê we şewitand, we ji ser axa we rakir, berê we da xerîbiyê, we bêserûşûn kir lê êdî xeman nexwin, em ê hisabê bipirsin û birîna we bipêçin. Em ê sûcdaran ceza bikin. Ji sala 1990’î ve gelên li cîhanê li ber derê vê dadgehê çûn û hatin. Tişta ku vê dadgehê kir bi awayekî pir qeba û rûmetşikên bi pera aşkirin bû. Îcar nav û têgînek bi navê tazmînatê jî lê kirine ku kî nebîne wê bibêje bi peran wê ev êş û azar were tanzîmkirin.

Li vê derê divê mirov parantezek ji bo dew û doza Roboskê jî veke. Wê were bîra we li Tirkiyeyê xwedê giravî ji bo sûcdar werin cezakirin mehkeme-şanoyek çêbû. Piştî wê sûcdar nehat cezakirin lê biryara tazmînatê derket. Dê û bavên wan zarok û ciwanan got; em xwîna zarokên xwe bi çend qirûşan nafiroşin û pere negirtin dewa cezakirina sûcdaran kirin. Erdogan wê demê got; wa em pera didin we de hiş bin êdî. Malbatan dozê bir ber dadgeha ku îro Spano serokê wê ye. Dadgeha Spano çi kir, dosyaya malbatan red kir. Îdiaya dadgehê ew e ku dosya di dema xwe de nehatiye temamkirin lê rastî ne wisa ye. Rastî ev e; wê dadgeha Spano beg jî weke Erdogan tenê pera bidaya. Malbatan jixwe pere qebûl nedikir wê demê ne hewce bû ku ev dosya bihata vekirin.

Bi vê serdana Spano êdî tu qîmeteke vê dadgehê jî nemaye lê ev nayê wê wateyê ku bila kes serî lê nede. Naxêr madem ew li serê gelan dek û dolaban digerînin divê ku ji her demê zêdetir mirov li dew û doza xwe, li êşa xwe xwedî derkevin û ew îcar werin egle û mijûlkirin. Tenê bi rêya dosyayan na, di vê serdema dîjîtal û teknolojiyê de bi çalakiyên cihêreng jî. Ji mehkemeya wijdanê mezintir mehkeme tine ye. Ew mehkeme di ser hemû mehkemeyan re ye. Îro roj pêdivî bi vê mehkemeyê heye. Ne tenê li Tirkiye û Kurdistanê li hemû cîhanê pêdivî pê heye ku ew norm û qanûn li gorî exlaqê civakê serwer bikin.

## SAZIYEK AN JÎ ZIMANZANEK NIKARE ZIMANEKÎ BIAFIRÎNE

# Ziman malê gel e

→ *Rizoyê Xerzî - Felat Niştiman*

Dema kesek, an jî saziyek gundê xwe, herêma xwe yan jî devoka xwe li ser yeke din ferz bike, ev hişmendî bi xwe re xetereyeke mezin tîne û zirarê dide ziman.Tişta girîng ew e ku em bîrekê çêbikin. Bîreke ku xebat û azmûnên berê jî tê de hebin lê ya girîng em ferhenga xwe nas bikin, em folklora xwe nas bikin û tomar bikin

## Omer Fîdan kî ye?



Li Pasûra Amedê hatiye dinyayê. Di navbera salên 2004 û 2011'an de li Enstîtuya Kurdî ya Amedê xebitiye. Di damezirîna TZP Kurdî (Tevgera Ziman û Perwerdehiya Kurdî) de cih girtiye. Ji 2005'an vir ve mamostetiya Kurdî dike. Ji 2013'an vir ve di KBG'ya Navenda PENa Kurd de cih digire. Yek ji endamên Sekreteryaya Damezirîner a Tora Ziman û Çanda Kurdî ye. Ji 2019'an vir ve ji bo Stêrk TV'yê bernameya wêjeyî ya bi navê 'Wêjevîn' amade û pêşkêş dike.

*Wekî hûn dizanin di 22-23'yê mijdara 2019'an da komxebata Tora Ziman û Çanda Kurdî hatibû pêkanîn û li ser mijarên ziman û çandê, danûstandin û gengeşe hatibûn kirin û ji aliyê 45 kesan ve bangewaziya pêkanîna komcivîneke berfireh hatibû kirin. Piştî wê bangewaziyê di 11-12'ê sibata 2020'an de li Amedê bi beşdariya nêzî 300 xemxurên ziman û çanda kurdî komcivînek hat lidarxistin. Ji bo agahiyên der barê van xebatan de, me vê hejmarê bi endamê Lijneya Şêwrê ya Tora Ziman û Çanda Kurdî Omer Fîdan re ev hevpeyvîn kir.*



***Di 11-12'ê meha sibata 2020'an de li Amedê bi beşdariya nêzî 300 kedkar û xemxurên ziman û çanda kurdî komcivînek hat lidarxistin û di wir de biryara hin xebatan hate girtin. We planeke çawa ji bo xebatên xwe amade kiribû û ew plan di çi astê de ye?***

Di destpêka vê xebatê de me bi gelek kes û aliyan re hevdîtin kirin û me dixwest ku em xebateke berfireh a her kesî bigire nav xwe bikin. Me dixwest ku hemû qad beşdar bibin, ji ber ziman û çand hemû qadan eleqedar dike. Bi vî rengî dema ku dest bi xebatê bû, nav û plansaziyeke vê xebatê tune bû. Loma jî kes û saziyên beşdarî vê xebatê bûn nav li xwe kirin û plansaziyeke xebatê dan ber xwe.

Ev xebat bi tevlêbûna wan 300 kesên di qadên xwe de pispor hatin ba hev û bi 12 maseyan xebat pêk hat. Vê yekê sînerjiyeke gelekî baş û hêviyeke xurt da. Lijneyeke şêwrê hate avakirin û wan jî ji nav xwe sekreteryayeke nû ava kir jî bo kar û xebatan bi rê ve bibe. Ji xwe berê her mase an jî qadekê ji wan 12 maseyan pêşinyarên xwe yên xebatê kiribûn.

Niha xebatên qadî didomin lê di têgihiştina wateya torê de hin problem hene. Gelek kes û saziyên ku bixwe endamên torê ne li hêviya kar û xebatên kesên di rêveberiyê û sekreteryayê de ne dimînin. Tor ne ew e, divê hemû endamên torê û maseyên ku hatibûn dabeşkirin di nav xwe de kar û xebatên xwe bikin. Di dema dawî de ji ber rewşa belavbûna nexweşiya koronayê gelek tişt hatine guhertin û bandoreke neyênî li ser xebatên me jî kiriye.

***Heta niha ji wê plana we dabû pêşiya xwe çi pêk hatiye, rexne li we tên kirin ku xebatên we di nav gel de tune ne?***

Wekî di wê civînê de hatibû diyarkirin ku diviyabû her temayek (maseyek) ji wan ji xwe re karnameyekê amade bike. Karnameyeke demkurt û yeke demdirêj û bidin xuyakirin ku ka dê ew ê çi xebatan bikin û pêşinyarî sekreteryayê bikin da ku bi rêk û pektir bibe û bihêle ku ew xebat werin sepandin. Bi wî wayî hatibû plankirin. Tor di civînê de biryar dabû ku rêziknameyek were amadekirin. Ew hat amadekirin û li maseyan hat belavkirin. Niha wekî mînak maseya ziman û perwerdeyê çend caran civînên xwe kirine, ya tenduristiyê carekê civîna xwe kiriye. Mixabin ji ber rewşa pandemiyê xebat hinekî sist bûne. Xebatên çandî bêtir xebatên qadê ne, xebatên li derve ne yên di nav gel de lê niha ji ber vê nexweşiyê ev hinekî zor e. Lewre jî rexneyên di vî warî de li me tên kirin di cih de ne. Li gorî min projeya ku ji bo ji Yekitiya Ewropayê (YE) tê amadekirin xebateke girîng e, ji ber ku Tirkiye bûye aliyê gelek peymanên navneteweyî lê li gorî wan peyman û daxuyaniyan tevnagere. Niha torê ev jî daye ber xwe ku rewşa binpêkirinên mafê ziman wekî rapor binivîse û raporên xwe bi YE'yê re par vebike. Heta niha raporeke ku ji 50 rûpelî pêk tê hatiye amadekirin, her wiha niha ez li ser anketekê dixebitim ku di dema civîna torê de wekî rapirsîn hatibû amadekirin. Rapora maseya perwerdeyê li ser bandora pendamiyê û raporeke din jî niha li ber destê min e ku heta mehekê ev her du raporên dawî jî dê biqedin. Ji bilî van, dê sê raporên din jî werin amadekirin. Tor hewl dide ku van kêşe û arîşeyên heyî ne tenê di nav kurdan de lê dixwaze wan ragihîne Ewropa û raya giştî ya navneteweyî jî. Tor dixwaze van çavdêriyên ku hatine amadekirin bi YE'yê re parve bike da ku bide xuyakirin çawa ew daxuyanî û peymanên îmze kirine tên binpêkirin. Her wiha daxwaza piştgirî û alîkariyê ji wan jî bike û wiha dewletê mecbûr bike ku gavên xwe li gorî wan peymanan bavêje.

***Gelek gazinc tên kirin û wekî dibêjin dawet ferikî û berbû hetikî, anku piştî vê civînê tu xebatên we yên berbiçav nehatine dîtin, hûn ji bo vê yekê çi dibêjin?***

Bêguman ew tespît, pêşinyar û biryarên di wê civînê de hatin kirin û xebatên heta niha hatine kirin ne li gorî hev in. Gelek xurt hatin gotin lê domahîka wan karan nehat ji ber belavbûna vê pandemiyê. Hinek xebatên din jî dibin lê ne bi navê torê dibin, bi navê wan kesayetî û saziyan tên kirin. Piraniya wan saziyan, erê endamên torê ne lê navê wan an jî logoya torê li bin wan xebatan nayê danîn lewra ji alî gel ve wekî xebatên torê nayên dîtin. Ji ber wekî min got di aliyê fêmkirina wateya torê de, ji alî beşdaran ve hîna şaşfêmkirinek heye. Jixwe xebat qels mane lê yên tên kirin jî bi vî rengî ne.

***Piştî ku Weqfa Mezopotamyayê pirtûka Rêbera Rastnivîsînê weşand gelek nîqaş hatin kirin. Tu van nîqaşan çawa şîrove dikî?***

Ev demeke gelekî dirêj e, ev nîqaş tên kirin. Ji aliyekî ve saziyên çapemeniyê li ser keysa berê anku li ser rêzimana bi pêşengiya Mîr Celadet Bedirxan hatibû nivîsîn berdewam dikin û aliyên din jî ku li gorî rastnivîsa nû ya Weqfa Mezopotamyayê amade kiriye dimeşin. Cara pêşî di bin banê Tora Ziman û Çanda Kurdî de gihane hev û ew tiştekî baş e. Ew xebat li gorî rêbaza xebata hatiye amadekirin xebateke baş û girîng e û xebateke bêhempa ye lê ji bo meseleya perwerdeyê divê bi beşdariyeke hîn berfirehtir bibe. Wekî hûn dizanin ziman bi awayê herî xweş bi perwerdeyeke giştî û bi çapemeniyeke neteweyî belav dibe û standartiyek jê re çêdibe. Li gorî min divê ew xebat bi kargeriyeke berfirehtir û bi tevlêbûna hemû saziyên perwerdeyê û yên çapemeniyê ku di bin banê torê de hatine ba hev, pêk were. Piştî wê di encama nîqaş û lihevkirinan de, encama derkeve holê wekî bibe biryarek û were sepandin. Ji ber ku ziman tiştekî zindî û guherbar e, divê mirov bi rengekî dogmatîk nêzî ziman nebe. Li gorî min divê mirov ji zimanê xwe hez bike ne ji fikra xwe û li gorî pêşketina wî xwe biguherîne. Sînorên ferhengan jî divê wek sînorên welatan biguherin. Her weşanxaneyek dikare ji xwe re hin kirîteran amade bike û bêje ez ji ber van sedeman li gorî vê yekê diçim lê ya girîng saziyên perwerdeyê û yên çapemeniyê ne û divê bi beşdariya wan biryareke yekgirtî bê girtin. Ne wiha be ew xebat jî wê bibe tenê xebateke girîng a ji gelek xebatên din.

***Pirsgirêka standartkirina zimanê kurdî di plansaziya torê de heye gelo, an jî ev sîwan dikare bi rol û misyoneke wiha rabe?***

Li gorî min saziyek an jî zimanzanek nikare zimanekî biafirîne. Ziman malê gelekî ye ew wî bi ku ve bikişîne, dibe. Zimanzan jî tenê wekî anatomiya mirovan çawa ku tesbît dikin (ev çav e, ev guh e û ev dev e) zimannas jî dikarin despîtên bi wî rengî bikin yanî tiştekî nû naafirînin lê tişta heyî destnîşan dikin, nav lê dikin û tesbît dikin. Pênase dikin da ku bi awayekî hêsantir bikaribin bikin malê perwerdeyê. Rast e daxwazên ji bo standartbûnê hene lê li gorî min wekî şexs ev yek ji bo kurdî dibe ku bi xwe re xetereyeke mezin jî bîne.

Dema ku kesek, an jî saziyek gundê xwe, herêma xwe an jî devoka xwe li ser yeke din ferz bike, ev hişmendî bi xwe re xetereyeke mezin tîne û zirarê dide ziman. Ya din jî tişta ku tor girîng dibîne û di nav biryarên sereke de ye, çêkirina bîrekê ye. Bîreke ku xebat û azmûnên berê jî tê de hebin lê ya girîng em ferheng û folklora xwe nas bikin û tomar bikin. Di demeke ku ji sedî yekê ferhenga kurdî nehatiye komkirin de, em karibin jî gerek em standartbûnekê niha çênekin. Meseleya standartbûnê divê hêdî hêdî be, peresîn be ne şoreş be. Divê em biryaran di odeyan de negirin û li ser gel ferz nekin. Tişta ku dikeve ser milê me ew e, em gel teşwîq bikin ku zimanê xwe bi kar bîne û çanda kurdî bê nasîn. Wê demê dê ji bo gel ji xwe bi awayekî xwezayî tiştek bibe. Ji bo standartbûnê jî divê perwerde û çapemenî ji alî ziman ve rengekî bipejirînin.

Xebatên bi vî rengî divê werin kirin lê divê li wan xebatan wekî ayetên quranê neyê nêrîn.

***Tu di rêveberiya Pena Kurd de jî cih digirî. Piştî pandemiyê gelek tişt guherîn û tu dikarî behsa xebatên Pena Kurd bikî?***

Pena Kurd li gorî min yekane saziya neteweyî ye; saziya ku ji her çar parçeyên Kurdistanê ji hemû zaravayên kurdan tê de cih digirin. Xebatên Pena Kurd bêtir bi Pena Navneteweyî re ne. Armanca wê ew e ku her tim bibe pirek di navbera nivîskarên kurd û nivîskarên welatên din de. Li gel hin kêmasiyan jî her Pena Kurd hewl dide ku vê peywira xwe bi cih bîne. Bi taybetî jî ji bo nivîskarên me yên di bin xetereyê de ne, dema ku neçar dibin welat biterikînin ji wan re dibe alîkar.

Berê Komeleya Nivîskarên Kurd hebû ku wê xebatên qadî dikirin lê piştî girtina komeleyê ew xebatên herêmî êdî nayên kirin lê rol û misyona penê wekî me got tiştekî din e ew pira di navbera nivîskarên kurd û yên Pena Navneteweyî ye. Niha li şûna wê komeleyek ava bûye lê hîna bi xebatên xwe yên li qadê nehatiye naskirin. Em tev li hemû civînên Pena Navneteweyî dibin û em dikarin bêjin ku di piraniya civînan de Pena Kurd mohra xwe li wan civînan dide û her wiha Pena Kurd di nav 10 penên herî çalak ên pena navneteweyî de cih digire.

***Ji bilî van karan bernameyeke wêjeyî jî pêşkêş dikî û hevpeyvînan bi gelek nivîskaran re dikî. Gelo der barê wêjeya kurdî ya îro de bi kurtahî tu dikarî fikra xwe bi me re parve bikî?***

Heta beriya çend salan me rexne dikir û digot wêjeya kurdî li Ewropayê geş bûye û ji ber ku ew ji welat dûr in zimanê ku bi kar tînin an jî awayê vegotina wan ne ji nav dilê welêt e. Her wiha meseleya asîmlasyonê û dûrbûnê bandorê li berhemên wan dike.

Li gorî min tişta ecêb niha piraniya nivîskarên kurd li welêt dinivîsin lê dîsa tiştekî bi vî rengî heye. Yanî mijara xwe ji jiyana kurdan pir zêde nagirin. Wekî mînakekê mirov dikare vê pirsê bike, gelo jiyana kurdan û ev 40 salên dawî yên şer û pevçûnan ku bandoreke mezin li jiyana wan dike, çiqas di wêjeya me de xwe daye der? Mijarên xwe pir zêde ji jiyana kurdan nagirin. Her wiha li gorî min meseleya elîtîzmê di nivîskariyê de heye. Nivîskarên dibêjin em nivîskarên baş in êdî xwe dikin hevalên nivîskarên biyanî. Xwe wek neynika gelê xwe, xwe wekî neynikeke paqij, xweşik û bedew ya gelê xwe nabînin û xwe dikin hevalên wêjevanên gelên din. Ev bi xwe jî dûrketina ji gel û rewşê nîşan dide.

# Rênas Jiyan berfê tîne

Şêrko Janzêm

**Rênas Jiyan, mîna helbestên xwe yên berê hatine çapkirin cardin mijarên sosyolojîk û mîtolojîk xistiye navenda helbestên xwe. Di helbestên Rênas Jiyan de gelek peyvên li ber jibîrkirinê ne hatine bikaranîn**

Rênas Jiyan heta niha bi gelek cureyên edebî derketiye pêşberî xwînerên xwe; helbest, roman, ceribîn, teorî-felsefe, çîrok û şano. Vê carê dîsa bi pirtûkeke helbestan xuya bû ku ev dibe pêncemîn pirtûka wî ya helbestan. Rênas Jiyan di pirtûkên xwe yên helbestan ên berê hatine çap kirin de gelek terzên nû ceribandibû û her wiha di van pirtûkan de cih daye şanoyan jî lê em di vê pirtûka dawî de ne şano û ne jî ceribînên nû dibînin. Ev pirtûk ji serî heta dawî ji helbestên serbest pêk tê.

Berfwerîn, tê wateya; 'ê/a ku berfê tîne'. Rênas Jiyan, peyveke ku bi xwe çêkiriye kiriye navê pirtûka xwe ya helbestan. Pirtûk ji 8 beş û 20 helbestan pêk tê. Jiyan, mîna helbestên xwe yên berê hatine çapkirin, cardin mijarên sosyolojîk û mîtolojîk xistiye navenda helbestên xwe. Di helbestên Jiyan de gelek peyvên li ber jibîrkirinê ne hatine bikaranîn. Ev peyv bi hosteyî hatine hilbijartin û di nav honaka helbestê de cihê xwe girtine. Li gel van peyvan gelek biwêj û gotinên pêşiyan jî hene.

Beşa yekem; **Destanên min, Destarê min**

*"pir nebû ez ê wek keviran bijîm:*
*hişk û nemir*
*ma jê pêvtir!?"*

Di vê beşê de 4 helbest hene ku her yekê navê xwe ji karektereke jin ên destanên kurdî girtiye. "Zîn", "Xec", "Edûl" û "Binefş"

Helbestvan di helbesta "Zîn" de dibe Mem di zindanê de, di helbesta "Xec" de li ser lat û zinaran sêwiyeke li dû pezkovîyan, di helbesta "Binefş"ê de li zozanên Berçelan û Qerejdax e, di helbesta "Edûl"ê de li ser pişta hespekî rewan e li miqabilî 1700 siwariyên dijmin.

Beşa duyem; **Şoreş elmas in bi berxwedanê ji binê erdê tên derxistin**

*"tev bela mijok û dilbijokan*
*zimanê me di devê me de riziya"*

Di vê beşê de 3 helbest hene. Her yek xwedî peyamekê ye; "Girtî", "Werin" û "Yekitî".

Helbesta "Girtî" ji bo girtiyên azadiyê hatiye nivîsîn. Tê de pesnê dilê wan ê pola û rihê wan ê azad dide. "Werin", helbesteke ji bo Rojava ye. Di vê helbestê de bang li êrîşker û dagirkerên Rojava dike dibêje 'Werin' lê dibêje hûn ê nikaribin li miqabilî şervanan bi ser kevin hûn ê bikizirin û herin. "Yekîtî" di vê helbestê de jî peymana yekitîya neteweyî dide. Dibêje; " werin em bibin 'kurd' wê çaxê kes nikare li ber me bêje 'kirt'."

Beşa sêyem; **Ez bi pênûsê bi ruhê xwe ketime**

*"nizanim çima gava ez te dibînim*
*ji te fedî dikim wek ku hinekan*
*kincên min ên binê yên qetiyayî dîtibin*
*nûya min*
*nede dû min*
*ez bi rêya mirinê nizanim"*

Di vê beşê de du helbest hene. Her du helbest jî bi peyvên resen û gundewarî hatine romantîzekirin. "Ax, Keçik!" di vê helbestê de sîtemek û bêrîkirinek heye. "Tu û Ta", di vê helbestê de wesf û şibandinên cuda li yar, dost û hevalê hatine barkirin.

Beşa çarem; **Pîvong keviran hembêz dikin**

*"welatê min di devê min de qelûn e*
*ev der efrîn e, axeke birûn e*
*ji porê me miştdehfikên mû ne*
*erdê wê ji bo meşa hûtan sabûn e"*

Di vê beşê de du helbest hene. "Şervan", di vê helbestê de qehremaniya şervanan heye. "Ferguson", wê helbestê navê xwe ji marka terextora Massey Ferguson standiye û 'ji bo cotkarê ku li Efrînê li ser terextorê hat kuştin' hatiye nivîsîn.

Beşa pêncem; **Helbestên science fiction (tevna zanistî)**

*"mirov*
*bi parsa ber derîyê dojehan*
*nabe xwdîyê bihuştan"*

Di vê beşê de du helbest hene. "Av Nema!", helbestvan di vê helbestê de balê dikişîne ser meseleyeke gerdûnî, xelaya avê. "Xewnbîn", helbestvan di vê helbestê de hêviyên xwe bi xewnbîna xwe ve girêdaye, xewnbîn rengê jiyanê ye.

Beşa şeşem; **Di tariyê de peyvan çerez dikim**

*"bîranîn wek cilên demode ne*
*tu li xwe bikî nabe*
*tu davêjî destê te lê nagere"*

Di vê beşê de sê helbest hene. "Jinên Sipîkuj", di vê helbestê de teswîra dayikê heye. "Sor û Sar" Rênas Jiyan ev helbest ji bo qîza xwe Ro nivîsiye yanî îlhama wî qîza wî ye. "Dêmên Demê" di vê helbestê de bêrîkirina demên berê heye.

Beşa heftem; **Taya gayan**


*"çû min derba xwe xawar*
*ez nema dihedirim*
*ma heta niha we dîtiye ku*
*ti gunehkarî ji dojeha xwe hez kiriye?*

Di vê beşê de du helbest hene. "Gataya Bextewariyê", gata peyveke ji zerdûştiyê tê, çarînên Zerdeşt in. Rênas Jiyan jî bi vê helbestê gatayek ji bo bextewariyê nivîsiye. "Fîlên Keserê", di vê helbestê de fîl temsîla mezinahiya kîn û keserê ye.

Beşa heştem; **Şevê kevz girtiye**

*"çavê te li mirin amin e*
*di min de mirin ne dudu ne*
*lê tu zanî nabûn ji te re tune ye*
*mirina min xulama te ye"*

Di vê beşê de du helbest hene. "Gulikê", ta'ma evîneke zarokî û zarokane ji vê helbestê tê. "Tu Nabê", helbesteke mîna gunehderxistanan e.




## Nexweşiyeke bi navê anakronîzmê



Samî Hêzil

Têgeha anakronîzmê -ku mirov wek çareyeke demborî vê têgehê wek dijdemî bike kurmancî û li benda bertekan bimîne- di jiyana entelektuelî de gelek caran tê bihîstin û dîtin. Belê, gelek caran wek rexneya fikrên hin kesan û ji bo destnîşankirina nakokiyeke demî, ew têgeh ji rexnekaran tê bihîstin; wek xeletî/nexweşiyeke nêrîna di nav metnekê de jî bi hêsanî ji hêla xwînerek baldar ve tê dîtin.

Anakronîzm ji bo ravekirina tiştekî ku ji hêla demê ve ne di cih de, an jî li hev neyê tê bikaranîn. Bêjeya "kron" wateya demê dide û pêşgira "ana" jî wateyên wek "jor", "paş" û "dîsa" didin. Destpêkê jî bo destnîşankirina xelet a dema tiştekî dîhat bikaranîn lê bi demê re ji bo temsîla bûyeran, kesan an jî tiştan a di nav peywendeke dîrokî ku tê de cih negirtiye an jî jê derneketiye holê hat bikaranîn û bi vî awayî jî wateya "dijî-demê" wergirt.

Mirov di tevgerên xwe de û di tercîhên xwe yên şexsî yên wek îmaj û cilûberg de, dikarin bi zanetî xwedî helwesteke anakronîst bin. Hunermend û nivîskar jî di berhemên xwe de carinan hêmanên anakronîk bi zanetî bi kar tînin da ku bandoreke tevlihev li ser hîs û hişmendiya mirovan pêk bînin. Mirovekî ku şal û şepik li xwe kiribe û qrawatek jî ji stûyê wî daliqiya be, an jî ciwanekî bi blue jeans bi qaydeyên rûspîyan biaxive, vê gavê em anakronîstekî bê zerer û piçek jî pêkenok an jî şirîn li pêşberî xwe dibînin.

Dema ku hesab tê ser şiroveyên derheqê mijarên giran, vê çaxê çi şirîniya anakronîst namîne. Li şûna wê şirînbûnê, gotin û helwestên kirêt û bêqîmet digirin. Anakronîzm li destê kesên niyet-xirab û nezan dikare bibe çekek xedar û wek şûrekî tûj dikare gelek tiştên nazik birîndar bike. Anakronîst di êrişên xwe de dibe ku pir çavsor tevbigerin û wek şervanên Berserker ên Îskandînav bê rawestan êrişê bikin.

Di vê mijarê de mirov divê du xasyetan ji hev cuda bike. A yekem anakronîzma ji ber kêmasiya lêkolînê ye ku ji nezanînê çêdibe. Lêkolîner ji ber agahiyên kêm ên der barê rewşa/bûyera kevn de şiroveya xwe bi tiştên/kesteyên berdest û bi têgehên rojane sînordar dike û bi vî awayî jî encameke bi fikrên sivik û serdagirtî derdikeve holê. A duyem bi fikarên politîk û bi helwest û refleksên çandî-civakî çêdibe ku qesteke neyartiyê tê de heye. Kesên xwedî wê qestê bi zanetî têkiliyekê di navbera bûyer, rewş, an jî hebûneke dîrokî de, fikr/darazên xwe çêdikin û mohreke qelp li tişteke resen didin. Ev têkiliya sûnî ya navbera tiştên cuda pirî caran bi şêweyê retorîkê û pirolekirinê xuya dibe. Hem retorîk û hem jî mubalaxa ji bo pejirandina fikra anakronîstîk a zorlêker dibin bingeha rewabûnê. Anakronîst bi ser navê rexneyê serî li populîzmê dide û eger pêwîst bike piçek hemasetê jî daxilî nav dike.

Anakronîst dema ku li dîrokê dinêre, ji bo şiroveyên bê serûber xezîneyeke bê serûbin dibîne. Ji bo şiroveyên xwe yên antîke di hebanê wî/wê de helwesteke îdeolojîk, têgehên qerimî û pêşdaraziyên şexsî hene. Bi derbeke pênûsê têkildariya dîrok û demê ya bi çand, ziman û edebiyatê qut dike, parçeyeke agahiya dîrokî jê dibire û dibe bi tişteke li zeman û mekaneke din ve dizeliqîne. Wek mînak, eger anakronîst bi bayê bezê berê xwe bide nav edebiyata klasîk, ê ji dest xwe re jî mesnewiya Xanî bernameyeke polîtîk derxîne, dê helbesta Cizîrî wek destpêka erebîzebûnê bi nav bike, an jî dê medreseyên kurdî bike hemtayê dibistanên herêmî yên bi navê YIBO. Divê mirov mînakan ji qadên din nede da ku kelûmelan nede destê wan, lewre em mînakan di wir de qut bikin çêtir e.

Hebûna kurdan helbet di roja roj de, li serdema me ya dêrîn û zêrîn, wek Uçayîşravasê mîrê hespan xwedî gewdeyeke heft ser bû; bes ji wan seran îro hema bêje sê man. Li ser gewdeyê me wek temsîla hebûna me sê ser hene: çand, ziman û dîrok. Yek ji wan jî yên din nabe. Lewre divê em şûrê destên anakronîstan ji wan bistînin da ku yekê ji wan bi/bê zanebûn jêneke, an jî ew serên me nebin qurbaniyên nexweşiyeke biyanî ya bi navê anakronîzmê û gewdeyê me di bin de nemîne. Çanda kurdan û zimanê kurdî bi hemû tiştên ku ketine tê û teşeyek kurdewar girtine; bi hemû tiştên ku jê derketine û hîn jî kurdewar mane biqîmet e, yek e û divê yekgirtî be.

# Armanca komxebatê hişyarkirina civakê ye

Navenda Nûçeyan

## Beşdarên komxebata şerê taybet dan xuyakirin ku armanca komxebatê hişyarkirina civakê û deşîfrekirina polîtîkayên şerê taybet e

Akademiya Civaka Demokratîk (ACD) hefteya borî Komxebata Şerê Taybet li Kobanê li dar xist. Rewşenbîr, nûnerên partiyên siyasî, hiqûqnas û çalakvan, hejmareke kesayetên serbixwe û endam û rêveberên saziyên Rêveberiya Xweser û nûnerên saziyên sivîl ên bajarê Kobanê beşdarê komxebatê bûn. Beşdarên komxebatê têkildarê şerê taybet ê li herêmê pêk hatî û bandora wî ya li ser civakê yek bi yek nirxandin. Di dawiya komxebatê de encamnameyek hat aşkerakirin.

Di encamnameyê de hat diyarkirin ku ji ber xeteriya şerê taybet û gefên ku li ser hebûn, nirx û çanda civakê komxebateke wisa hat lidarxistin û li ser rastiya şêwazên xeternak, çareseriyê jî nirxandinên berfireh hatin kirin. Di encamnameyê de wiha hat gotin: "Bi şewaza şerê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tînin, armanc dikin ku hevgirtina civakî û destkeftiyên gelên herêmê, rêveberiyê û hêzên leşkerî yên herêmê têk bibin û serwerî û dagirkeriyê li ser civakê ferz bikin. Divê şaştî û valahiyên ku dijmin bi kar tîne bên çareserkirin û dagirtin, çi di rêveberiyê de çi jî di civakê de be. Her wiha divê pêşniyarên di komxebatê de derketine holê bibin proje û mekanîzmeyên guncaw ji bo pêkanîna wê bê afirandin."

**'Bi pîvanên civakê tê lîstin'**

Me xwest em çend nirxandinên beşdarvanan jî bînin ziman. Hevseroka Yekîtiya Rewşenbîrên Kobanê Leyla Ebdo diyar kir ku şerê taybet di bingehê xwe de civakan aramanc digire û got: "Bi rê û rêbazên cuda civakan li gorî berjewendiyên xwe diguherîne ku bighêje asta koletiyê. Ji bo pêkanîna van xalan, bi exlaq, nirx û pîvanên civakê tê lîstin."

**'Bikaranîna zagonan girîng e'**

Hevseroka Meclisa Edaletê ya Herêma Firatê Nesra Xelîl jî di axaftina xwe ya komxebatê de bal kişand ser qanûnan û mijar wiha şîrove kir: "Rêjeya diziyê gihîştiye asteke bilind, bikaranîna madeyên hişbir derketiya asta herî jor. Divê ev xal baş bên şîrovekirin. Pêwîst e em hemû sazî û rêxistin bi van mijaran re mijûl bibin. Pêdiviya me bi bikaranîna zagonan heye."

Endama Navenda Lêkolînên Jineolojiyê ya Herêma Firatê Ferza Xelîl, da zanîn ku divê mirov hevrûkirinekê çêkin, ka civaka beriya şoreşê û piştî şoreşê çawa bû û wiha axivî: "Pirsgirêka sereke ya Kobanê eşîrî û ol ye. Rêjîma Baasê çi pirsgirêk çêdibûn vedişartin lê niha gelek pirsgirêk aşkera bûn û divê bên çareserkirin."

**'Ciwan tên dîlgirtin'**

Endama Koordînasyona Kongreya Star Mizgîn Xelîl li ser mijara rewşa jin û ciwanan rawestiya û wiha nêrîna xwe anî ziman: "Hêzên hegomonîk ji bo desthilatdariya xwe bi bandor bikin, herî zêde jin û ciwanan bi kar tînin. Ciwan hêza herî girîng ya civakê ne. Loma dema ciwan werin dîlgirtin, tê wateya bi civak tevahî tê dîlgirtin. Dewlet şerê taybet bi awayekî zirav li hember ciwanan bi kar tîne. Lîberalîzmê weke waneyeke sereke dide pêş ku di bin navê azadiya takekesî de teşwîqî jiyana bi tenê û ez, eziyê dikin. Di bin navê azadî û modernîteyê de, ciwanan daduqirtîne, mêjî û ruhê wan dike mulkê xwe. Her wiha bi riya medyaya civakî ajoyên zayendî zêdekirin, teşwîqkirina fihûşê, rewakirina zewaca temenê biçûk dike. Ciwanan dixin nav tora sîxuriyê. Jin ji rastiya xwe hatiye dûrxistin û li ser bedena wê bazar tê kirin. Loma divê ku em di hemû qadan de têbikoşin. Pêwîst e ku têkoşîna jinan xwe bispêre bingeheke zanist ku şerê taybet rawestîne."

Endamê Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê Adil Yûsif da zanîn ku di komxebatê de gihaştin vê yekê ku, heke rêveberî bixwaze li hemberî planên dijmin bisekine divê gelek gavan bavêje; perwerdekirina civakê, peydakirina pisporên derûnî û kontrolkirina meteryalên xwedinê û mijûlbûna bi çîna ciwanan e.

**'Dê semîner bên dayîn'**

Çalakvanê Mafên Mirovan Îdrîs Nesan diyar kir ku komxebat bi semîneran dewlemend bû, tê de şerê tayet û alavên wê hatin nîqaşkirin, her wiha rewşa jin, ciwan, rola saziyan Rêveberiya Xweser û çawaniya pêşxistina wan hatin nîqaşkirin. Nesan got ku divê rêveberî kêmasiyên saziyan bibîne da ku di pêşerojê de dubare nebin û hêvî kir ku kesên guncaw di saziyên guncaw de werin erkdarkirin da ku xebatên saziyan bi pêş bikevin.

Endamê Komîteya Amadekar a Komxebata Şerê Taybet Ziyad Îbrahîm bal kişand ser armancên komxebatê û got: "Hemû tiştên ku di vê komxebatê de hatin parvekirin wê guhdarkirî be. Dê aliyên têkildar li ser pêşniyarên di komxebatê de hatine girtin, li ser erdê pêk bînin da ku têkiliyên xurt di navbera rêveberî û gel de encam bide. Di demên bê de dê li herêmên me li navendên saziyên Rêveberiya Xweser semîner werin dayîn."



### Çareserî bi rêxistinbûnê pêk tê

Her wiha jinan jî Konferansa Kongreya Star a Kantona Kobanê ya 4'emîn bi dirûşmeya "Bi têkoşîna Zehra û Hevrînan, em ê dawiyê li dagirkeriyê bînin û Şoreşa jin misoger bikin" li dar xist. 150 delegeyên jin tev li konferansê bûn.

Di dawiya konferansê de jinan encamnameya xwe ji raya giştî re aşkera kirin. Li gorî biryarên hatin girtin; dê roja 23'yê hezîranê bibe roja bilindkirina têkoşîna li dijî êrîşên li ser jinên berxwedêr û bi çalakiyan were bibîranîn. Her wiha dê li gund, navçe û bajarokan komîte bên rêxistinkirin, ji bo aboriya jinan dê xebatên cuda bên kirin.

Di konferansê de geşedanên siyasî bi awayekî berfireh hat nirxandin. Jinan destnîşan kir ku ji bo serkeftinê divê rêxistinbûneke xurt pêk bê.

Di konferansê de Hevseroka Giştî ya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Eyşe Hiso bal kişan ser geşedanên siyasî yên li Sûriye û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û got: "Em weke gelê Sûriyeyê û pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê rêya azadiyê, hebûn û neteweya demokartîk hilbijartiye. Me çeteyên DAIŞ'ê têk birin û cîhan ji terorê parast, me hemû hevsengiyên cîhanî guhertin. Ev pêşketin serkeftina projeya me ye."

Endama Koordînasyona Kongreya Star Hîva Erebo jî axivî û bal kişand ser têkoşîna jinan û wiha axivî: "Hemû destkeftiyên di destê jinan de bi saya vîna jinên têkoşer û dildarên azadiyê hatin mayîndekirin. Kongreya Star rêxistineke jinê ye û li dijî hişmendiya civakê ya paşverû li ber xwe dide."

# DYA hejmara leşkerên xwe kêm dike

Rêveberiya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) biryar da ku hejmara leşkerên xwe yên li Iraqê ji 5 hezar û 200'î daxîne 3 hezaran.

Şefê Fermandariya Leşkerî ya Rojhilata Navîn a DYA'yê General Kenneth McKenzie li Bexdayê bi daxuyaniyekê ragihand: "DYA di zanebûna pêşveçûnên mezin a hêzên Iraqê de ye. Her wiha bi koordînasyon û şêwirmendiya bi hevkarên me ango hikûmeta Iraq û hêzên Koalîsyonê biryar daye ku di meha îlonê de hêza xwe ya leşkerî ya li Iraqê ji 5 hezar 200 kesî daxîne 3 hezar kesan."

Serokê DYA'ê Donald Trûmp der barê kêmkirina hejmara leşkerên xwe yên li Iraqê de meha borî nêrîna xwe gotibû. Hêzên DYA'ê ji dawiya sala 2011'an û heya niha ji Iraqê vedikişiya lê piştî çend salan di bin navê têkoşîna li dijî DAIŞ'ê de careke din hêzên xwe şandin herêmê. *BEXDA*



# Pirsgirêka sereke ya Tirkiyeyê çi ye?

Navenda Lêkolînên Qada Sosyo-Polîtîk, di navbera 14 û 23'yê tebaxa 2020'an de, li 13 bajarên bakurê Kurdistanê, têkildarî meylên hilbijêran lêkolînek kir. Di vê xebatê de, helwest û nêzîkatiya hilbijêran a ji bo pirsgirêk û çareseriyên bingehîn ên li Tirkiyeyê hatin destgirtin.

Ev lêkolîn li bajarên Amed, Wan, Êlih, Colemêrg, Mêrdîn, Şirnex, Riha, Agirî, Bedlîs, Îdir, Qers, Mûş û Sêrtê hatiye kirin. Ji bo vê lêkolînê bi awayê onlîne bi 918 kesan re havdîtin hat kirin. Yek ji pirsên ji beşdaran hatiye kirin wiha ye; "Li gorî we pirsgirêka sereke ya Tirkiyeyê çi ye?"

Ji sedî 45,3'yê beşdaran bersiva "Pirsgirêka kurd e", ji sedî 27,9 "Bêkarî/aborî", ji sedî 4,4 "Nebûna Demokrasiyê", ji sedî 3,9 "Şer û pevçûna heyî", ji sedî 3,9 "hikûmet", ji sedî 3,3 "Rewşa pergala hiqûqî ya heyî", ji sedî 3,3 "nebûna mixalefetê", ji sedî 2,6 "Pergala serokomariyê", ji sedî 1,7 "Cemaeta Gulen/FETO" û ji sedî 1,3 "DAIŞ û rêxistinên radîkal" dan. *AMED*





## Parlamenterên Başûr bertek nîşan da

Di dema dawî de gelek endamên Tevgera Azadî, helbestvan, nivîskar, mamoste û aktivîstên civaka sivîl li sînorê parêzgeha Hewlêr û Dihokê hatin binçavkirin û heta niha jî çarenûsa wan nediyar e. Ev binçavkirin û girtin di nav beşên cuda yên civakê de bûye sedema nerazîbûnan.

Li ser mijarê parlamenterê YNK'ê yê Parlamentoya Herêma Kurdistanê Luqman Werdî nêrîna xwe vegot: "Di dema derbasbûyî de li Herêma Kurdistanê li gelek cihan xwepêşandan hatin lidarxistin. Bi taybetî jî li sînorê Duhok û Hewlêrê hejmarek ji çalakvan, rojnamevan û nivîskaran hatin girtin."

**'Gelek çalakvan hatin girtin'**

Werdî, da zanîn ku wek parlamenter bi hemû awayî van binçavkirinan şermezar dikin û wiha got: "Ev binçavkirin ji derve de bandorek neyênî li ser şêwazê hikûmdariya Herêma Kurdistanê çêdike. Li sînorê parêzgeha Hewlêrê bêyî ku welatî beşdarî xwepêşandan û çalakiyan bibin gelek çalakvan, helbestvan û nivîskar hatine binçavkirin. Ev kiryar bi salan e li Hewlêr û Duhokê dubare dibin û bi rastî jî kiryarên ne baş in."

**Ji dengên azad ditirsin**

Parlamenterê Nifşê Nû li Parlamentoya Herêmê Sîpan Amêdî jî li ser heman mijarê axivî û destnîşan kir ku binçavkirina azadîxwazan, rojnamevanan û çalakvanan wê yekê nîşan dide ku desthilat bi rastî gelek lawaz e û tirsa wê ji dengên azad heye. Amêdî, da zanîn ku ji ber hikûmet dizane wê êdî gel li hemberî van binpêkirin û bêdaletiya heyî bêdeng nemîne û wiha axivî: "Wê rojek were kesên ku niha di girtîgehan de ne wê bibin sembola rûxîna vê desthilatê."

Parlamenterê Serbixwe Mem Burhan Qanih jî li ser binçavkirinan got: "Hem wek parlamenter hem jî wek Komîsyona Rewşenbîrî ya Parlamentoya Kurdistanê me lêkolîn kiriye. Em li dijî binçavkirina rojnamevan, çalakvan û kesên li ser fikir û ramanên xwe yên siyasî hatine binçavkirin in. Em van binçavkirinan şermezar dikin. Daxwaz ji aliyên peywendîdar dikin ku tevayî kesên hatine binçavkirin werin berdan."

**Dê rapor bê amadekirin**

Li ser mijarê Serokê Komîsyona Mafê Mirovan a Parlamentoya Herêma Kurdistanê Romeyo Hekarî jî da zanîn ji ber serdaneke wan a ji bo Îdareya Germiyanê wan nekarî di dema xwe de serdana Behdînanê bikin û wiha domand: "Di demeke nêz de wek Komîsyona Mafê Mirovan em ê serdana Behdînanê bikin û ji nêzîk ve lêkolînê li ser rewşa binçavkirinan bikin. Piştre jî em ê raporek li ser tevayî girtiyan amade bikin û wê raporê peşkêşî serokatiya parlamentoyê bikin û raya giştî jê agahdar bikin." ***HEWLÊR***

# Girîngiya serdana heyeta Rûsyayê bo Şamê

Navenda Nûçeyan

**Dengvedana protokola di navbera MSD û Partiya Vîna Gel a Sûriyeyê de cihekî taybet di rojeva siyasî de digire û piştî serdana heyeta Rûsyayê êdî her kes li benda helwesta hikûmeta Şamê ye**



Wekî tê zanîn beriya demekê di navbera Meclisa Sûriyeya Demokratîk û Partiya Vîna Gel a Sûriyeyê de li Moskovê protokolek hatibû îmzekirin. Xalên esasî yên vê protokolê, navendîbûna Sûriyeyê û şêwazên erkên wê ne. Ji bo çareseriya pirsa kurdî li Sûriyeyê li gorî hevpeyman û qanûnên navneteweyî vîna gel esas bê girtin û rêxistinkirin. Di civînê de bal kişandibûn ser rola HSD'ê ya li dijî terorê û jiyana hevpar a li herêmê û dîsa ewlehiyê. Ew protokola ku di navbera van her du aliyên siyasî de hatibû îmzekirin gelekî girîng bû ji bo aktîfkirina diyaloga Sûrî-Sûrî û di wî warî de gaveke pêşeng bû.

Hêjayî gotinê ye her çendî ji aliyên cuda ve MSD wek temsîlkarê kurdan bê dîtin jî lê di rastiya xwe de di nav MSD'ê de hemû gelên wê herêmê cih digirin û temsîla hemû herêma ku di bin serweriya wê de ye, dike.

Rûsyayê jî piştgirî dabû vê protokolê û piştî wê bi çend rojan heyeteke payebilind a rayedarên Rûsyayê ku di nav de wezîrê karên derve Sergy Lavrov jî hebû serdana Şamê kir û bi rayedarên hikûmeta Sûriyeyê re hevdîtin kir. Lewre jî çavên her kesî li hêviya encamên vê serdanê ye ku gelo dê bersiva hikûmeta Şamê ji bo vê lihevkirinê çi be.

Her çendî Rûsyayê bi rengekî aşkera piştgiriya vê protokolê kiribe jî dîsa divê mirov hinekî bêhna xwe fireh bike û li hêviya berteka hikûmeta Şamê ya di pratîkê de bimîne. Gelo dê heta çi radeyê bi pêşinyara Rûsyayê ya di vî warî de qayil be. Bi her halî ew protokol û lihevkirinên bi vî rengî yên di navbera hêzên siyasî yên Sûriyeyê de paceyeke xêrê ye û rê li ber çareseriyeke demokratîk vedike. Her wiha hewldanên bi vî rengî dê çareseriyeke li gorî dilê hemû gelên Sûriyeyê bîne.

Hemû lihevkirin û peymanên hêzên desthilatiyê li ser axa Sûriyeyê dikin bi tenê li ser bingeha berjewendiyên wan welatan dihatin avakirin, ne ji bo çareserî û berjewendiyên gelên Sûriyeyê. Dema diyalog, peyman û lihevkirin di nav hêzên Sûrî-Sûrî de çêbibin wê gavê dê dawî li şer û pevçûnên zêdeyî 10 sal in didomin, bi dawî werin. Dê riya çareseriyeke aştiyane ya li ser bingeha rêzgirtina li mafên gelên Sûriyeyê bi pêş bikeve.

Ji aliyekî din ve hevdîtinên wiha ji bo siberoja Sûriyeyê gelekî girîng in, ji ber ku Rûsya bûye aktoreke herî sereke li Sûriyeyê û dikare zextê li rejîmê bike da ku êdî ji bilî şer, bi riyên aştiyane çareseriyek were dîtin.

Bi her halî ev lihevkirinên wiha ku pêşî li diyaloga di navbera hêzên siyasî yên Sûriyeyê de vedikin dê bi xwe re encamên erênî û baş bîne û rê li ber bazirganên şer û pevçûnan bigire û bi xwe re çareseriyeke aştiyane bîne. Jixwe daxwaza hemû gelên Sûriyeyê jî ew e, êdî dixwazin li welatê xwe di nav aramiyê de bi rûmet bijîn.

## Şerê kurdan ê navxweyî xwekuştina siyasî ye



Di 2'yê îlonê de serokomarê Fransayê Emmanuel Macron serdana Iraqê kir. Macron bi berpirsên Iraq û Herêma Kurdistanê re civiya. Piştî wê bi du rojan Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî serdana Tirkiyeyê kir. Barzanî bi Serokomarê tirk Erdogan û rayedarên din yên Tirkiyeyê re civiya. Balkêş bû ji bilî PDK'ê ti nûnerek hizbên din di şandeya serokê Herêma Kurdistanê ya ji bo Tirkiyeyê de nebû. Piştî hevdîtinan Berpirsê Peywendiyên Derve yê Herêma Kurdistanê Sefîn Dizeyî di daxuyaniyek ji bo Dengê Amerîkayê de aşkera kir ku yek ji mijarên sereke yên civîna Barzanî û Erdogan PKK bû.

Têkildarî vê serdana Barzanî siyasetmedar Mihemed Emîn Pêncwênî wiha got: "Nêçîrvan Barzanî nameyek tûnd û bi hêz a Macron a li dijî Tirkiyeyê gihand Erdogan. Macron di nameya xwe de diyar kiriye ku êdî ji niha û şûn de Tirkiye nikare destdirêjî bike ser xaka Iraq û Herêma Kurdistanê û siyaseta xwe ya dagirkirinê bi cih bîne."

Pêncwênî qala hewildanên Fransayê yên ji bo sînordarkirina kiryarên dewleta tirk jî kir û wiha domand: "Fransa dixwaze Iraq û Herêma Kurdistanê têxe eniya li dijî Tirkiyeyê û kurd nebin hevkarên dewleta tirk. Ev enî li dijî sîstema desthilatdar a Tirkiyeyê ye. Ji bo wê jî rayedarên tirk zextan li ser serkirdeyên kurd dikin da ku xwe nedin aliyê Fransayê."

Têkildarî hevdîtina Barzanî û Erdogan a li ser mijara PKK'ê jî Pêncwênî wiha axivî: "PDK di aliyê leşkerî û siyasî ve ne di rewşek wisa de ye ku bikare şerê PKK'ê bike. Her berpirsek kurd ji her aliyek serdana Tirkiyeyê kiribe. Tirkiyeyê daxwaz jê kiriye bi her awayek divê dijberiya PKK'ê bikin û li gel Tirkiyeyê alîkar bin."

Her wiha Pêncwênî diyar kir ku dema şerê kurd û kurd rû bide, wê bibe xwekuştina siyasî. Wê zirar bide hemû aliyên kurdî. Proseya siyasî ya li başûrê Kurdistanê heye wê nemîne.

Têkildarî hewildanên dewleta tirk ên ji bo dubendiyê têxe nav aliyên kurdî jî Pêncwênî got: "Dewleta tirk bi hemû derfetên siyasî, aborî û îstixbarî dixwaze hêzên kurd li aliyê xwe bihêle û neçin aliyekî din. Ji bon wê zextek zêde li ser aliyên Herêma Kurdistanê dike û nahêle hêzên kurd xwedî gotarek siyasî ya yekgirtî bin." ***SILÊMANÎ***

## Armanca civîna 7 welatên Ewropayê

Bi armanca avakirina helwesteke yekane û rakirina aloziya heyî ya di navbera Tirkiye, Yewnanistan û Qibrisê de, li Fransayê lûtkeyek hate lidarxistin. Wezîrên Spaniya, Malta, Îtalya, Portekîz, Qibris û Yewnanistanê beşdarî lûtkeyê bûn.

Wekî tê zanîn ev civîn ji bo zelalkirina helwesta welatên Ewropayê ye, da ku di civîna li Brukselê de helwesteke hevpar derkeve holê. Serokê Fransayê diyar kir ku di lûtkeya Ewropayê de ya dê rojên 24-25'ê meha bê li Brukselê were li darxistin, dê têkiliya Yekitiya Ewropayê bi Tirkiyeyê re bibe mijara sereke.



Li gorî dezgehên çapemeniyê yên Yewnanistanê Atîna dê ji bo çareserkirina aloziya deryaya Spî pêşniyaran ji NATO'yê re jî pêşkêş bike û ew ê ji bo vekişandina keştiyên Tirkiyeyê ji deryaya Spî bi daxwazên xwe ve girêdayî be. Her wiha diyar kir ku Atîna bê gef û provakasyonan dê ji bo çareserkirina aloziyê bi nîqaşan ve girêdayî be û ew ê ji bo kiryarên dewleta irk belgeyan pêşkêşî NATO'yê bike. ***PARÎS***

## Misir: Divê welatên erebî eniyek yekgirtî ava bikin

Wezîrê Karên Derve yê Misrê Samih Şukrî, di civîna Wezîrên Karên Derve yên Welatên Erebî de daxwaza yekhelwestî û yekgirtina welatên erebî ya li hemberî destwerdanên dewleta tirk kir.

Beriya çend rojan li paytexta Misrê Qahireyê dibin serokatiya Misrê de civîna wezîrên karên derve yên welatên erebî ya li ser destwerdanên dewleta tirk ên di welatên erebî de hate lidarxistin.

Di civînê de Wezîrê Karên Derve yê Misrê Samih Şukrî li dijî destwerdanên dewleta tirk banga avakirina eniyek yekgirtî ya ereban a dibin serokatiya Misrê de kir. Samih Şukrî siyaseta dewleta tirk wek gefa herî mezin a li ser ewlehî û aramiya welatên erebî bi nav kir. Şukrî da zanîn ku dewleta tirk bi hezaran çete derbasî Sûriyeyê kirine û ji wir jî dişîne Libyayê û bi vî rengî metirsiyek mezin li ser serwerî û ewlehiya herêmê çêdike. ***QAHÎRE***



# Lê Amedê Amedê...

Seyidxan Anter

*Çaxa ku Apê Mûsa li strana Lê Amedê Amedê, guhdarî dike û mîna derwêşê erbana wî di dest de, zarokê di hembêza xwe de bilind dike, hindik dimîne ku baskên wî çêbibin*

Em li warê Atsrid Lindgren in. Asrid Lindgrena nivîskar a kitêbên zarok û xortan wek EMÎL ê jêhatî, şûm û meraqdar. Her wiha PÎPPÎ LÂNGS-TRUMP a ji xwe bahwer, wêrek û serfiraz. Çavên Asrid Lindgren li paş wê neman.

Şoreşgerê Bolşevîk Viktor Sergey, di bîranînên xwe de bala me dibe ser xalekê û kêm-zêde wisa dibêje; dilşadîya herî mezin a nivîskarekî ku xewn û xeyalên wî dibin rastîya jiyanê.

**100 saliya Apê Mûsa**, ya li ser internetê, ya tebaxa 2020'an peywen herî nû ne. Li wir tespîtên wêje, raman û stîla nivîsandinê yên Apê Mûsa tên vegotin. Mirhem Yigit ê ji me gelek kesan bêtir pêwendîyên wî pê re hebûn, kronolojîyek hewldanên Apê Mûsa ji guhdaran re destnîşan dike.

**XWEBÛN'**ê der barê Apê Mûsa de çend gotin ji min xwestine. Helbet adet e mirov serpêhatîyên xwe lê dike, lê ez ê bersiva pirsa ka Apê Mûsa çi tîne bîra min jî ji xwendevan re bêjim.

Mûsa Anter li Kurdistanê; Şabanê, Dêrzendîkê, Hatxê, Darê, Omeryayê, Torê, Bohtanê, Serhedê, Qerejdaxê, Meletiyê, Koçgiriyê, Dêrsimê, Mahabadê, Hewremanê, Koyê, Qamişloyê, her wiha Stenbolê, Pragê, Parîsê û Munîhê tîne bîra min.

Apê Mûsa, wek ku Memed Uzun bixwe dibêje mamosteyê wî, hevalê Tarik Ziya Ekincî, hogirê Faik Bucak û Yusuf Azizoglu û destbirakê Îsmail Beşikçî bû. Nas û naskirîyê her kurdekî ku ji bo serfirazîya kurdan û mirovayetîyê têdikoşe û çaxa ku diqewimî bi hevalê xwe Orfî Akkoyunlu pêşewazî û parezwanê şewa Sêregê yî salên 1966-77'an ku Yilmaz Guney lê dipeyivî. Jiyana zindana nas heval û dostên wî zêdetir bibûn.

Îca, rengê jiyanê yê Apê Mûsa aliyê wî yê herî balkêş û girîng e. Apê Mûsa ji Kerkûka Dildar, heta bi Stenbola Şukru Baban û Ferda Çetîn, Parîsa Kamûran Elî Bedirxan, Praga Qasimlo û New Yorka M. Remzî Bucak, tevnek ji peywendî, raman, wêje û zanyarîyê saz kiribû ku tayên wê yê herî bihêz û saxlem Suadîye, Stilîlê û Amedê bû ku xelkê xwe li wan digirt.

Her çiqasî dema ku di warê aborî de lê teng dibû, Mûsa Anter konê xwe li çola Zivingê vedikir jî, warê wî Stîlîlê (bûka xemilandî) bû. Ji qewlê Apê Mûsa ve, wî li Stîlîlê şarja xwe dadigirt. Gotinên Stîlîlyan ji bo wî muzîk bûn. Şêxê Kûtê ku dîwana Cegerxwîn û kitêbên Apê Mûsa di axura xwe de vedişartin. Zinoya ku li ber bayê Mûsa Anter rabû ku xwe bigihîne Edeneyê. Çinara Apê Mûsa ku bi ser minara Stîlîlê dikeve, Evdiyê Zîno (Çali) bixwe çandîye. Hisênê Çirî, Şema ku nîvê Stîlîlê kiriye merivê xwe, Gêncoyê "reşkê şevê" û "keliza" Hilwa û zarokan ku ji Apê Mûsa re digotin: "Weleh sebra te jî bi me tê."


Di havîna 1990'î de, li ser xwestina wî dê me bi hev re "Çîroka Darê" binivîsanda. Di wê navê re tîmê fîlmê Mem û Zîn hatin serdana Apê Mûsa û karê me jî neçû serî. Lewra dîroka malbata Anter ji Anterê Şêxo û wir de ji Darê dest pê dike.

Berê jî hatîye gotin lê rojekê em bi Apê Mûsa re, bi teksîya Xelikî diçûn Amedê, me Sultan Şeymûs derbas kir, bi rê de ew mesele ji me re got: "Heger hûn vê riyê bikolin hûn ê nikaribin ji hestîyê laşan bimeşin. Hunera Xalid Bin Welid gelek in. Û heger mirov binê bedena Amedê bikole hûn ê li laş û hestîyên sîxuran rast bên. Sîxurên ku hev ji dewletê re divîbûn."


Apê Mûsa kefenê wî tim pê re bû, lê haya wî jê tunebû ku wê kolanên Amedê bi xwîna xwe av bide.

Wek ku piranîya me lê temaşe kiriye, çaxa ku Apê Mûsa li strana **Lê Amedê Amedê** guhdarî dike û mîna derwêşê erbana wî di dest de, zarokê di hembêza xwe de bilind dike, hindik dimîne ku baskên wî çêbibin.

Çavên Apê Mûsa li paş wî neman!



Wêne: Ji kovara Bîrnebûn. Apê Mûsa bi xelkê Anatolya Navîn re



## Ji Delav

Feratê Dengizî

## Hebûn

Di hengameya jiyanê de mirov dikeve gelek rewş û derûniyên curbicur.

Carinan dilxweşî, carinan bêbiryarî, carinan bêhêvîtî, carinan dilcoşiya hêvîdoş…

Zêde bala me kurdan, van çend salan e li ser ziman e. Di gelek semîner, panel, hevpeyvîn û hwd. de ev zêde xweş û bi kûrahî tê nîqaş û ravekirin. Bi min bi derengî be jî ev karekî xweş û baş e, li gel kêmasiyan. Lewra rewşa jiyan, bindestî û dinyê tê zanîn, di hinek waran de bêhêzî, qelsî têra tiştinan nake. Gazin, endîşe, şik, guman û pêşniyaz derdikevin holê.

Ez bixwe jî carinan dikevim rewşên bêhevî; "way liminê, ziman çû…!

Gelek caran ev derûnî li me gelekan dibe bar.



Bi rastî jî ji bon zimanê me xetere zêde ne. Rewş têra gelek tiştan nake. Zarokên me yên heta nerin dibistanê her tim û xweş bi kurdî dipeyivin (bi zêdeyî) jî ku diçin dibistana seretayî, piştî çend salan hew bi kurdî dipeyivin û tew hinek jî bîra dikin. Îja hinek malbat li malê ji destpêkê bi zaroyên xwe re bi kurdî napeyivin ku malkambaxiya mezin ev e. Ya rast ev rewş bi şiroveyan, rastî bi şiroveyên min jî dernakeve holê. Lêkolînên civakî û nirxandina wan karekî berfireh û karê pisporan e. Em dilêşiyê rojane dijîn û hilbet wek aktivistekî zimanê kurdî peyt û ramanên min, fikir û fikarên min jî hene û metirsî zêde ne. Malbat li malê bûne du nifş; navser û yextiyar bi kurdî, zarok û ciwan bi tirkî dipeyivin. Nifş, yanî yextiyar, ciwan, navsere û zarok bi hev re bi tirkî dipeyivin. Zimanê malê dibe tirkî.

Em dizanin ku domdarî û hebûna ziman bi xêra zarok û ciwanan e, ma hima em kal û yextiyar bibin pisporê zimên ew ê çi encamê derxe, berê me li gorê ye, ku nebe malê zarok û ciwanan. Lewra domdariya ziman û jiyanê bi wan e.

Tehde, xeyd, rexne, acizî tu encamê nadin...

Dibe ku hestiyar bim.

Dizanim divê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeyê, xwestek û rastiya esasî ev e û lê bi ya min ev jî têrê nake. Rewşa Başûr li holê ye û fermîtî û perwerde jî carinan wek dilê mirov dixwaze encamê nade. Heyraniya zimanê serdestan malxerabûn û nexweşiyeke me ya neteweyî ye. Bazar, lîstikên kolanan û warên civat-civakî nebin kurdî, em derûniyek kurdewar bi cî nekin, encam ne xêr e. Babilî, akadî, latînî û hwd. jî zimanê fermî û perwerdeyê bûn, ka îro li ku ne..! Ziman divê ruhê civakê be. Piştî ewqas hengameyên giran, demdirêjiya dîrokê kurdî têknebiribe, divê em kûr bifikirin, kumê xwe deynin ber xwe û hezar carî bifikirin. Ji bo zimanê me seferberiyek ruhî, derûnî û her wiha lazim e. Hişmendiyek xurt, zaneyî, berpirsiyarî lazim e ku ew ê bibe bingeha yekitiyê jî.

Dem dema vê ye.

Em çi bifikirn, çawa bawer bikin; çi gundî, çi bajarî, çi xizan, çi dewlemend, çi karmend, çi payebilind û nizam çi… divê xala me ya hevpar kurdî be. Bêyî ku em dilê hev bihêlin, xwe bixeyidînin, bi zaneyî, bi derwêşî divê em zimanê xwe bi kar bînin ku ew li me bibe xwedî û hebûna me bipeyitîne. Lewra ziman bi rastî jî hebûn e, hebûnek ku nayê pênasekirin. Birastî peyva pîroziyê ji hindik e, carinan bi pîroziyê em tiştan wenda jî dikin. Jiyaniyek rasteqînî kar û berpisiyariya civaka kurdan e. Ne dema rev û fitlonekan e!

Min dirêj kir. Û ev nivîs têra zelalkirina mijarê nake, lewra ev bîr kûr e lê derbirina dilêşiyekê ye; dilêşiyek hebûnî û civakî. Me hindik bedel neday û êdî bilêvkirina qedirbilind, payebilind û cangoriyan ew ê propagandeyek erzan be, li min biborin û ne hedê min e. Dijberên me di çi êrîşan de ne, ne hewceyî qalkirinê ye, ew li tunekirin û kokqelandina me digerin, hov, erişkar û çavsor in. Her kar û stratejiya wan li ser asasê tunekirina me ye. Ne hewceyî şirove û korbûnê ye. Necamêran di vê rewşa nexweşiya cîhanî ya Kovid-19'ê de jî li bayê xwe dinêrin, ba li me tînin û kîna dilê xwe vedirişin.

Dixwazim balê bikişînim ser xetereyeke jiyanî. Derdê min ev e. Em kurd tev bi hev re bifikirin.

Li bernameyên TV'ên kurdî tevan, bi qasî ku fersendê dibinim û têdigihêjim temaşe dikim, guhdarî dikim. Çend roj berê di bernameyekê de rewşa min serobin bû. Neyîniya hişê min, bêhêvîtiya min li binê guhê tehtekî, li himekî mezin ket. Keçeke ciwan ku min navê wê nû dibihîst; Hêja. Hunermend Hêja, paşê ez ê hîn bibim ku navê wê ciwanokê Hêja Netirk e. Hin tiştên dinê jî di derheqê wê de hîn bûm. Tu her bijî keçkokê, bi peyv, tevger, deng, hewes, sînerjî, derûnî… bi her awayî kurdî jê dibariya. Em bi malbatî pir kêfxweş bûn. Di heftê û yek saliya xwe de ev cara ewil e ku dilopek hêsir a dilgermiyê ji çavê min herikî. Bê hemdî min dilxweşiya xwe da der, êşa bi salan a ser dilê min sivik bû.

Her wiha dê ev ziman her bijî, heta abadînê.

Metirsiya min a dilêş hebikî ferikî, belkî jî ez meseleya metirsiya ziman pir mezin dikim. Coşiyek ket dilê min, û min xwest parve bikim. Min go gelo ev enerjî, ev sînerjî, ev vejena jiyanî nabe ku bibe derûniyek civakî! Divê ku ev ruh belav bibe wek têgeriyê. Bila ev bibe mînak, ku di vê tengasiyê de ruhekî wisa derkeve, belkî jî sira emirdirêjiya kurdî di vê xalê de be; derûniyek jiyanî ya kurdewar…

Na tu têkiliya vê bi nijadperestî, nizam ezezî, paşvemayîn, tengfikirîn û nizam çi 'îzman ve nîne. Ev heqîqet û rasteqîniya hebûnê ya jiyanê ye. Hebûn bi xwexapandin û derûniya serdestan a xerîban nabe. Cîrantî, hevaltî bi hev re jiyana gelan hilbet rewşek mirovîn e, lê divê em "Xwe" bin. Wekehevî, biratî, şarezayî, şaristanbûn, demokratî… bi "Xwe"bûnê ye. Wek ku N. Hikmet dibêje; "wek darekê yek û azad û wek daristanekê bi biratî!" Têkiliya mirovî, mirovîn, mirovbûn wisa ava dibe.

Wisa difikirim.

Bimînin bi ruhê kurdewariyê…

Firçeya şikte

# Hunerê resimî de cinî

*Gulçîn Adar*

Wexto ke merdim tarîxê resimî rê ewnîyeno, vîneno ke tewr zêde morê xo camêrdan dayo piro. Na rewşe Rojhelato Mîyanênî ra bigîrê heta Amerîka, Asya, Afrîka û heta Ewropa her ca bi eynî rengî yo

Hunero ke tewr zêde cinî bêpar û bêname ameya verdayene resim o. Cinî, no warî de çinbîyaye ameya hesibnayene. La pêwa pêro nê çiyan reyna zî fek nê hunerî ra vera nêdaya û bîyayîşê xo ramojna ya. Eke ma destpêkê resimî de zî resimê şikeftan ra bigîrê dest; no huner heta seserra 10ine bi îmzayê camêrdan aseno. Her çend cinsê viraştişê xêzê şikeftan nêro zanayene zî semedo ke babeta înan; sehneyê seyîdwanî, şer, pêrodayîş û ûsn bîyê viraştişê ci camêrdan ano hişê însanî. La beno ke ma nê texmînî de şaş ê! Beno ke viraştoxê nê xêzan cinî bê zî! A game persêko wina yeno hişê merdimî. Gelo heta seserra 18ine nameyê ciniyan çira hunerê resimî de nêaseno? Gelo camêrdî bîyê asteng, yan cinî resim dir eleqedar nêbîyê? Helbet no nîno a mana ke cinî heta o wext dest nêdaya viraştişê resimî. Labelê qeydan de ne tabloyê înan û ne zî nameyê înan derbaz nêbeno. Ma zanê ke Dewro Mîyanên de cinî, her het ra hetê hukmê camêrdan de planê diyîn de ameya verdayîş û kêm ameya dîyayîş. Hetê huner, kar û zanistî de ca nêdayê ciniyan. No nîno manaya ke cinî tena karê keyeyî dir eleqedar biya. Ciniyan huner zî zanistî zî û çîyê bînan dir zî eleqedar bîyê û kerdê labelê o wext de hetê zîhnîyetê camêrdan ra qels ameyî vînayene, çîyê înan rê erce nêameyê dayene û coka hîn ciniyê hunermendî mecbûr mendê ke bi nameyê camêrdan berardişê xo pêşkêş bikerê û biroşê.

Nînan ra yew zî Judît Leyser (1609-1660), hunermenda Holandayije bi resimanê xo yê naturmord yena naskerdene la dimayê ke resamo Jan Mıense Molenaerî dir zewicyena bi îmzayê mêrdeyê xo tabloyan roşena û vila kena. Xeylê xo bi no hawa ancax bi nameyê pîyê xo yan zî birayê xo yê ke ressamî bîyê dayê qeydkerdene. Yanî cinî heta seserra 17-18ine nêeşkaya binameyê xo resim ser o ca bigîra. Ancax binê veresîye camêrdan de eşkaya hunerê xo veja werte.

Hunerê resimî de gama ke merdim cigêrayîş keno ewropa de tewr vernê rastê ciniyê ressaman ra; Levîna Teerlince (1510-1576), yeno. Levîna, xoceyê resamo namdar Hans Holbeinî hetê Qiral VIII. Henryî ra unwanê resamî dîyeno ci. Sofonîshba Anugissiloye (1532), zî dinya de reya ewil unwanê resamî ê mîyannetewî dîyayo ci. Çîyo taybet zî hîn xêzkerdişê Michelangelo kopya kerda û seba rexnekerdişî ci rê ameyê erşawitiş. Lavînia Fontana (1552-1614), Artemîsîa Gentileschi (1593-1652) nê her di zî hetê pîyê xo yê resaman ra dersî girewtê û verê înan de viraştişê resimî musayê. Nînan ra Artemîsîa Gentileschi; reya ewil akademî rê ameya qebulkerdene û resimê ci hemverê komelê patrîyarkalî de sey serewedaritiş ameyê binamekerdene. Resimanê xo de her wext ciniyan; hêzdar, cengwaz, xoser xêz kerd. Elîsabetta Sirani (1638), reya ewil seba ciniyan atolyeya resimî akerda. Elîsabetta verê pîyê xo de resim musena û dima ra berardişê aye pîyê aye ra hîna zaf yenê ecibnayîş. Camille Claudel (1864-1943) demê aye de perwerdeyê girewtişê ciniyan qedexe yo. Camille, perwerdeyo taybet gêna. Heykelê ci xeylê yenê ecibnayene û bi viraştişê heykelan yena naskerdene. Frîda Kahlo (1907-1954) zî pêwa bi nasnameyê resamî, hem femînîst û hem şorişgêr yena zanayene. Frîda, tarîx de sey hunermendêka têkoşer û şorişgêr yena naskerdene. Seke aseno ciniyê ke Rojawan de ciwîyayê, bi asanî nêeşkayî xo ramojnê û hunerê xo pêşkêş bikerê. Hem têkoşînê cinsî dayê û hem zî têkoşînê berardişê xo dayê.

Na babete ser o ma eşkenê seba Rojhelato Mîyanênî vajê ke verê Rojawanî de rewşa ciniyanê resaman hîna xirab asena. Rojhelato Mîyanênî de merdim, ciniyê hunermendan zaf erey sehneyê tarîxî de vîneno û merdim derheqê tarîxê ci de nêeşkeno bi hawayêko zelal tespît bikero. Beno ke nê cografyan de cinî resimî dir eleqedar nêbîyê yan zî îmkanê înan çinbîyê. Seba viraştişê resimî materyalî girîng ê. O wextî de destkerdişê materyalan hende rehet nêbîyo. Sewbîna kultur, bawerî û adetî zî serê bîyayîş û nêbîyayîşê hunerî de tesîrêko girîng keno. Eke merdim nê çîyan zî biyaro verê çimî nêaseyîyaşê ci yeno famkerdene. Her çiqas ma vajê îmkan û wareyê viraştişê resimî çinbîyo zî her cinî goreyê şert û mercê cografyaya xo neqş û nigarî serê hacetanê xo de kerdê. Taybetî zî eke ma qalê cografayaya Kurdistanî bikerê; cinî hunerê xo serê kîliman de serê potikan de û serê çî bînan de hîsê xo fikrê xo ardê ziwan. Her rengî rê manayêke bar kerdê. Gama ke merdim biewno ê neqşan ra zano ke bi çi hîsî ameyê viraştiş. Hêvîyê înan, dejê înan, cuya înan, xemgînî û kêfweşîyê înan xo ramojnenê. Layê destê ciniyan bîyê firçe û hoke bi hoke reng neqş kerdê. Cinî nêeşkayê hunerê zerrîya xo bêveng verdê û bifetisnê. Her ca de, her ware de, her wext de awankerdişê hunerî vetê werte û waştişanê xo resm kerdê.

Goreyê ke aseno kifşkerdişê resimî her çiqas hetê cografyan ser o bivuryo zî la bi cigêrayîşan dir vejêno meydan ke hunerê resimî de cinî her cayê dinya de zaf erey ripelê tarîxî de ca girewta. Xeylê faktorî biyê sebeb ke nameyê ciniyan çinbo û no hunerî ra dûr vinderê. Helbet nê sebeban ra tewr ewil, komelê patrîyarkalî yo. Ciniyê ke resimî dir eleqedar biyê, bêrûmet ameyê vînayene. Xirab û lêşin ameyê vînayene. Resimê înan bêqalîte ameyê vînayene. Zewac înan dir nêameyo kerdene. Êyê ke zewicyayê zî karê keyeyî înan rê ameyo ferzkerdene. Pêwa hende çiyan reyna zî ciniyan xo dûrê viraştişê resimî nêdayê. Bi nameyê camêrdan hunerê xo pêşkêş kerdê la reyna zî fek vera nêdayê. Bi astengkerdiş û sînorkerdişan milê xo nêkerdê çewt û hemverê her tewir çinbîyayîşî dir sere wedarnayê û vatê ke; şima do bîyayîşê ma qebul bikerê! Şima do hunerê ma, rengê ma, şorişê ma, têkoşînê ma qebûl bikerê! Eke şima firçeyê ma bişiknê zî ma do bi porê xo û bi pîjikan firçeyê xo viraznê. Şima tuwalanê ma bidirnê ma do dêsan, kaxidan, kerreyan û daran bikerê tuwal! Şima renganê ma qedexe bikerê û birijnê zî ma do bi vaşan, bi nebatan, bi qeweyan xeyalanê xo, fehmê xo û serewedaritişanê xo resm bikerê. Do deryayê hunerê ciniyan ziwa nêbo û pêl bido heme seranserê dinya...



# Umid çiqas çîyêko weş o...

**Nevîn Alkan**

Ez no hewte derheqê hedîseyêk ke ez yew aşme nîme ra nata bena şahidê ci de nusena. Verê cû zî çîyo ke merdimî rê sey mucîze yeno ameybî serê mi û ripelêko newe cuya mi de ameybî akerdene. La no hedîse her çiqas ke nêro serê mi zî ez yewa yew bîya şahidê ci û tesîrê hedîseyê zêde zêde hîs kena. Çi beno wa bibo mi fehm kerde ke ganî merdim umidê xo vindî nêkero, la her çî rê zî hadre bibo.

Seke yeno zanayene Vîrusê Korona (Covid-19) peynîya aşmanê serra 2019î de bajarê Çînî yê Wuhanî de goreyê îdîayan kesimxaneyêk heywanan de vejîya werte. Dima ra zî hema hema vilayê pêroyê dinya bî. Amed bajarê ke vîrusî ra zêde tesîr bî ra tena yew o. Goreyê dayeyanê fermî zî rewşa Amedî baş nîya û xeylê vaka ci de estî. Yew hewte verê cû ame vatene ke Amed de goristanê Vîrusê Korona de 540 kesî ameyî defnkerdene.

Taybet xebatkarê weşîye no proses de benî şahidê xeylê hedîseyanê trajedîkan. Wina asîyeno ke heta ke no jan mîyanê merdimîye ra xovera nêvejîyo, ya zî dermanêk ci nêro vînayene do wina dewam bikero. Qasê ke ez vînena xeylê keyeyan de muhaqak vaka ya zî kesê ke vîrus girewtî û weş bîyî estî. Merdim biwazo nêwazo zî prosesêk winasî de beno şahidê hedîseyanê trajedîkan.

Înan ra yewe zî dayika embazêk mi ya. Dayika embazê mi de rîşa merdimwere yê çije û rîşa merdimwere ê gonî estî. Çijeyêk aye çin o û ê bînî de zî nêweşî esta. Heto bîn de rîşa merdimwere ê rahîmî zî serranê verênana de bîyarnaya û xeylê nêweşîyê bînî ci de estî. Wexto ke merdim aye vîneno vano na cinî senî bi nê nêweşîyan pay de vindena û heyranê zerrîweşîya aye maneno. Neyse na merdima rinde herçiqas ke grûba rîskin ê vîrusî de biba û xo bipawa zî peyêna peyên aye zî vîrus girewte. 12 rojan keye de mende la rewşa aye çiqas şî giran bî. 21 rojan beşê ciewnayîşê giranî de mende. Doktoran vatî ke nêweşîyê ci ê sewbîna zêdeyî na ciniye îhtimalêk zêde vîrus ra nêxelesîyena, herçî rê hadre bibêne. La sey doktoran nêbî, cayo ke pêroyê umidan qedîya de cinî xover da. Vera vîrusî de têkoşînêk xurt da meşnayene û 8 rojî yo ke beşê ciewnayîşê giranî ra vejîyaye û odeya normalî de yena tepiştene.

Çîyo ke bala mi ante pêroyê merdimê û domanê ci zî tede nêweş ra umidê xo birnayî û paweyê xebera mergê aye vindetî. La wexto ke mi cinek reyde qisey kerde ez bermaya û mi vat ke nêweşî nê dayîkbîyayîş aye vîrus ra xelesna. Mi rê vat ke mi hemşîreyan rê pers kerde telefonê kamê mi şima de esto, ê vatî ê lajê to (xora tena lajêk aye esto). Dima ra vat ke mi xo bi xo vat eke çîyêk bibo mi do xebera mi sere de şêra lajê mi ro, lajê mi do aye wext se bikero û bikewo rewşêka senî. No hedîse ra dima cinek vata ke ganî ez weş biba, nê-nê do xebera mergê mi şêra lajê mi ro. Nika ma doktoranra pê hesîyayî ke kesê ke aye reyde şîyî beşê ciewnayîşê giranî ra tena aye û sewbîna ciniyêk xelisîyayî û ê ke 21 rojan beşê ciewnayîşê giranî ra weş vejîyayî tena 2 cinî yî.




# Sekvanê girgire



Di nav bêlûkê de nîşana herî xirab a Remzî bû. Wisa xirab bû ku hevalan bi henekî digot, 'heval Remzî fîşek bavêje fîlekî, nikare li fîlê bide' û tinazên xwe pê dikirin. Dema diçûn perwerdeya çekê jî heman rewş berdewam dikir. Remzî nikarîbû bi îstiqrar fîşek li nîşanê bide, carnan yek lê dida carnan jî qet lê ne dida. Ev yek Remzî gelekî aciz dikir. Ji ber vê digot teqez çeka ez pê fîşekan davêjim eyara wê xirabe ye û wisa hincet didît, lê bi heman çekê gelek kesên davêtin û gelek xweş jî li nîşanê didan. Ev rewş demekê wisa berdawam kir. Rojekê dora aşpêşvaniyê hat ser Remzî. Ew roj bêlûk di perwerdeyê de bû. Remzî ji bo xwarinê çêke pewîst bû biçe galonek av bîne. Kanî jî qedara 20 deqeyan dûrî bêlûkê ye.

Ev pîvan e, dema biçî ser kaniyê, divê bi çek bî. Remzî rahişt galon û çeka xwe û bi alî kaniyê ve meşiya. Qederî pêncî metreyî mabû ku bigihîje avê, dît ku qertelek ji ser kaniyê rabû û li ser wê dífire. Remzî her ku nêzî kaniyê dibû, qertel hîn jî hewl dida ku tiştekî ji erdê rake.

Remzî dibîne ku dê qertel tiştekî ji erdê rake lez dike û fîşek dide ber çeka xwe û berdide. Qertel bi dengê çekê êdî hêviya xwe dibire û bilind difire.

Remzî bi kelecanî ber bi kaniyê ve dimeşe. Dema tê ber kaniyê, çi bibîne, kîvroşkek ji stûyê xwe bîrindar li ber mirinê ye û dilebite.

Remzî dibêje 'dêmek wî qertelî ev kîvroşk nêçîr kiriye lê dema min dît tirsiya û firiya.' Remzî dike rahije kîvroşkê, fikrek tê hişê wî û fîşeka ku gavek din dabû ber çek ê bera cihê birîndar ê stûyê kîvroşkê da.

Remzî rahişt galona ava xwe û kîvroşka xwe û berê xwe da ber bi bêlûka xwe ve. Dema hat ber aşxaneyê dît ku hevalan navber daye perwerdeyê.


Vêca her kesî dengê fîşeka Remzî bihîstibû. Kîvroşka li pişta Remzî jî dîtin matmayî man û pirsîn; "Remzî te ev kivroşk nêçîr kir?"

Remzî got 'erê min fîşek ji dused metreyî li stûyê kîvroşkê da, de ka mêze bikin.'

Hevalên derdorê lê nihêrtin rastî jî fîşek li stûyê kîvroşkê ketiye. Her kes bi awayekî şaş û heyirî mabû. Remzî bi awayekî serbilindî wiha got: "Ez rica dikim ji îro pê de ji min re nebêjin Remzî bêjin sekvanê girgire.

***Heval Mistê***

# XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Paytexta Sûriyeyê 3. Çarçoveya derdora bejing an jî seradan
5. Pêşî. Hê ku nebûye 6. Heywaneke bi fen û xapan tê naskirin 7. Alî
9. Gelacî, fesadî 12. Helbestkarekî kurd ê navdar. Navê wî yê rastîn; Mele Xidir Ehmed Şawaysî 14. Cejin 15. Harbûn. Aqilavêtin
17. Vexwarina sereke 18. Bersiva neyênî.
22. Hunermendekî kurd ê başûr, …..Zaxoyî

JI JOR BER BI JÊR

1. Pevçûn 2. Hestiyên pişta mirov
3. Bêavbûn
4. Notayeke muzîkê
5. Xelkê herêma Botanê
7. Fêrbûn, elimandin
8. Kesên zimanê wan nagere, nikarin biaxivin
10. Ax, cih 11. Dawî
13. Navê mehekê
14. Perestî
16. Mektûb
19. Arvan, genimê hêrayî
20. Roja em tê de ne
21. Rojeke hefteyê
23. Cînavkeke pirjimar. Awayê tewandî yê cînavka 'hûn'ê

*Bersiva hefteya borî*




# Min zimanê tirkî ji bîr kir

Demekê ji bo ku zimanê kurdî rewa bibe, girtiyên li girtîgehê parastina xwe bi zimanê kurdî dikirin. Wê demê ez jî hevserokê Kurdî-Derê ya Şaxa Semsûrê bûm. Ji Meletiyê parêzer telefonî min kir. Ji min re got, derfeta we hebe hevalek xwe bişînin. Ji bo biçe li dadgeha wê derê parastina girtiyan a bi kurdî, wergerîne tirkî. Min jî du sê caran hevalên xwe şandin dadgeha cezayê giran a sêyemîn. Ji bo wergerê bikim carekê ez bi xwe jî çûm Meletiyê.

Li wir ez û parêzer, em bi hev re çûn dadgehê. Parêzer nasnameya min bir cem serokê dadgehê. Ji bo ez wergerê bikim êdî tu astengî li pêşiya min nemabûn. Em bi hev re çûn ketin hundirê eywana dadgehê. Girtiyên ku ji girtîgehê anîbûn dadgehê jî hemû xwendekarên zanîngehê bûn. Dema ez û girtiyan nêzîkî hev bûn, ciwanekî destê xwe dirêjî min kir got merheba mamoste. Hîn min kir ku ez destê xwe dirêjî wî ciwanê hêja bikim û bêjim ji te re jî merhaba. Min dît ku leşkerekî ji me re got hop, hop, hop... Min jî got hop hop çi ye?

Wî jî ji me re got destgirtina we ya hevdu qedexe ye. Min jî bi kurdî ji wî ciwanî re got bila ne xema we be. Ew destûrê nedin ku destê me bigihîje hev jî dilê me her tim bi hev re ye. Ez di dilê xwe de jî bi helwesta wî leşkerî gelek aciz bûm.

Hemû parêzer û xizmên girtiyan jî li eywana dadgehê bûn. Cara ewilî ye ku dikim wergerê bikim. Bi rastî ez gelek bi kelecan bûm. Ciwanekî rabû parastina xwe bi zimanê kurdî kir. Diviyabû ku ez jî ji dozger û dadgeran re wergerînim zimanê tirkî. Min berê xwe zîvirand aliyê serokê dadgehê û bi zimanê kurdî parastina wî ciwanî ji wan re got. Serokê dadgehê ji min re got, Şerîf bey girtî bi zimanê kurdî parastina xwe dikin. Qet nebe tu ji kerema xwe re bi me re bi zimanê tirkî biaxive. Min jî got hakim beg ji bo ku ez di jiyana xwe de her tim bi zimanê kurdî diaxivim, min zimanê tirkî ji bîr kiriye. Serokê dadgehê ji min pirsî got tu çi karî dikî? Min got ez hevserokê Kurdî-Derê me. Dema min li dadgehê wisa got, ciwan û parêzer û xizmên girtiyan ên wê derê hemû jî gelek kêfxweş bûn.

Pişt re min parastina wan ciwanan bi rêk û pêk wergerand zimanê tirkî. Ji bo ku peywira min ew bû. Vê carê parêzeran parastina hemû girtiyan kir. Parêzer Hasan Dogan jî got, "Birêz dadger we berê digot ku em van ciwanan berdin dê bi hev re biçin çiyê, êdî pêvajoya aştiyê dest pê kir van xwendekaran berdin bila biçin zanîngehên xwe bixwînin. Serokwezîrê we dibêje 'keçikno de biçin dibistanê.' Hûn jî keçikên ciwan digirin û dikin girtîgehan. Dadger beg wisa jî nabe."

Dadgeha wan ciwanan qediya. Ez û parêzer derketin derveyî eywana dadgehê. Parêzerên ji bajarê Amedê hatibûn, hemûyan li wê derê jî ez pîroz kirim û gotin xwezî me hemûyan zimanê tirkî mîna te ji bîr bikira.

Xwendekar û xwendevanên hêja. Gotinek heye dibêje 'çû şûna miriyan her kesek li ser miriyê xwe giriya.'

Kula dilê min jî her tim zimanê kurdî ye.

***Şerîf Yilmaz***

# Hejmara nû ya Dilopê derket

Hejmara 16'emîn a kovara Dilopê ya du mehî ya çand, huner û polîtîkayê derket. Di vê hejmara kovarê de mijara dosyeyê rewşenbîrê kurd Osman Sebrî ye. Osman Sebrî, di vê hejmarê de hem bergê kovarê hem jî dosyeya kovarê dadigire. Dosye bi keda Firat Ceweri, Mehmet Oncu, Şeyhmus Dîken û Hêvî Sebrî ya qîza Osman Sebrî hatiye amadekirin. Di dosyayê de qala jiyana Osman Sebrî ya li Semsûrê dest pê dike û li Şamê bi dawî dibe, tê kirin. Dîsa fikra sosyalîst a Osman Sebrî ku baş nayê zanîn di dosyayê de tê vegotin.

**Mijara ziman didome**

Mijara dosyeya borî ya kovarê statuya ziman û bikaranîna wê bû. Di vê hejmarê de jî ev nîqaş berdewam e lê ji aliyê ekonomî-polîtîk ve. Necat Ayaz ê lêkolîner bikaranîna kurdî ya ji aliyê çînên civakî ve dide ber hev. Ayaz, mînakên dinyayê nîşan dide û bal dikişîne ser dewlemend û xizanên kurd bê ka kîjan çîn çima bêhtir bi kurdî dipeyive. Di vî warî de Ayaz rexneyên muhîm li tevgera kurd a li bakur dike û pê re tespîtên girîng datîne holê.


Ayhan Erkmen jî di hejmarê de qala serpêhatiyên sosret ên malbata Ebasê Miho dike. Mesut Alp jî di vê hejmara kovarê de berê xwe dide dîroka Mezopotamyayê û dikeve pey şopên deqan. Nivîs bi wêneyên rengîn ên Selmet Guler rengîntir dibe.

**Mijarên cuda digire dest**

Rîtuela din Cejna Hinaran a Hewramanê ye. Îbrahîm Şadman li ser vê rîtuela yarsanan nivîsiye. Uranus Alizadeh a wênekêş jî bi wêneyên xwe atmosfera festîvalê radixe ber çavan. Îsal du neferên muzîka kurdî ji nav me bar kirin. Du Seîd; Seîd Yûsif û Seîd Gabarî, di nav du mehan de wefat kirin. Zeyneb Yaş, di vê hejmarê de li ser van her du Seîdan nivîsiye.

Mela Mihyedîn jî ligel şopdarên herdu Seîdan, ligel Koma Lawje ku dixwaze muzîka gelêrî ragihîne ciwanan û dahatuyê hevpeyvînek çêkiriye. Çîroka avakirina Lawjeyê, armanc û hedefên wan ji aliyê her sê endamên komê ve bi sohbeteke geş tên ravekirin.

Weke hejmarên borî Fewzî Bîlge yê xêzkar dîsa bi tabloyeke xwe û şîroveya vê tabloyê kovarê rengîntir dike. Şairên vê hejmarê Osman Sebrî, Tûrgût Ûyar û Narîn Omer in. *AMED*




# Belgefîlma bêedaletiyê: Mamoste

Navenda Nûçeyan

*Belgefîlma bi navê Mamoste ya li Amedê hatiye çêkirin kurtejiyana sê mamosteyan ên piştî hewldana darbeyê ji karên xwe hatine avêtin vedibêje. Zor û zehmetiyên mamoste jiyane, mijara belfîlmê yên sereke ne*

Fragmana belgefîlma bi navê "Mamoste" yê çîroka sê mamosteyên bi Biryara di Hukmê Qanûnê de (KHK) ji karên xwe hatin avêtin vedibêje, hat belavkirin.

Li Tirkiyeyê 15'ê Tîrmeha 2016'an di nav dewletê de klîkek hewl da darbeyeke leşkerî pêk bîne. Ev hewldan neçû serî û piştî vê di aliyê siyasî, leşkerî û gelek waran din de serdemeke nû dest pê kir. Dewlet û hikûmeta li ser kar, bi hemû hêza xwe bi ser muhalefetê de çûn; bi hezaran kes hatin girtin û bi dehhezaran kes ji karên xwe hatin avêtin.

**Belgefîlma sê mamosteyan**

Belgefîlma Mamoste ya li Amedê hatiye çêkirin kurtejiyana sê mamosteyan ên piştî hewldana darbeyê ji karên xwe hatine avêtin vedibêje. Ev sê mamosteyên endamê Sendîkaya Kedkarên Perwerde û Zanistê (Egitim Senê) ne, piştî ji karên xwe tên derxistin her yek ji wan bi karên cihê hewl dide debara xwe bike. Zor û zehmetiyên mamoste jiyane, mijara belfîlmê yên sereke ne.

Derhêneriya belgefîlmê M.Salih Çelîk û Kemal Hazanay kiriye û çêkerê belgefîlmê jî li ser navê Tor Fîlmê Ferat Kevir e.




**Belgekirina serdemekê**

Çêkerê belgefîlmê Ferat Kevir diyar dike ku piştî hewldana darbeyê, gelek hevalên wan bi awayekî bêhiqûq ji karên xwe hatin avêtin û sazî û dezgehên wan hatin girtin. Kevir dide zanîn ku belgekirina vê rewşê wek sînemager peyvira wan bûye û armanca çêkirina belgefîlmê 'Mamoste' wiha dibêje: "Hikûmetê darbe kir hincet û bi KHK'an gelek xebatkar ji kar avêtin. Armanca me ev bû ku em vê neheqiya li mamosteyên Egîtîm-Senê hatiye kirin vebêjin. Me ji nav wan xebatkaran jiyana sê mamosteyan kir mijar ku piştî ji kar hatine avêtin nesekinîne û jiyana xwe bi berxwedêrî domandine."

Belgefîlmê 40 dk ye, fragmana wê hat belavkirin. Piştî pêşandana li mihircanan wê pêşî li Amedê were pêşandan.

**Fragmana belgefîlmê:**

https://www.youtube.com/watch?v=EBefsTfZcuU&feature=youtu.be

# Aramê 7 pirtûkên kurdî çap kirin



Weşaxaneya Aramê, di şert û mercên giran ên pêvajoya pandemiyê de jî kar û xebatên xwe yên weşangeriyê didomîne. Aramê yek jê tirkî 7 jê kurdî bi giştî 8 pirtûkên nû çap kirin û xwendevan dikarin van pirtûkan li pirtûkfiroşan peyda bikin.

Xeyala Vegerê romana Huseyîn Duman a yekemîn e. Ji 184 rûpelan pêk tê. Di romanê de serpêhatiya Sebrî ku 20 salan di girtîgehê de maye tê vegotin. Roman bi tehliyeya Sebrî dest pê dike û bi bîranînên wî yên 20 salan berdewam dike. Nivîskarê pirtûkê Huseyin Duman 27 sal in girtî ye û niha li Girtîgeha Tîpa T a Bûrhaniyeyê tê girtin.

Agir Bi Berfê Ket roman e û berhema Savaş Amed a yekemîn e. Ji 428 rûpelan pêk tê. Roman serpêhatiya komek şervanên ku di sala 1993'yan de di şert û mercên giran de jiyane vedibêje. Xwendevan bi rûpelên romanê re dibe şahidê rêhevaltî, hezkirin û berpirsiyariya vê komê. Nivîskar her wiha xwendevanan dide kêleka xwe û wan li zozanên Berbihîv, Xerzan, Xaçareş, Mutkî, Amed, Bedlîs û Zovaserê digerîne û wan dike şahidê lehengiyê.

Nivîskar Savaş Amed di sala 1973'yan de li navçeya Pasûr a Amedê ji dayik bûye. Di sala 1992'yan de tev li têkoşîna azadiyê dibe û birîndar dibe. Di 2010'an de li Rojava tê girtin û rejîma Sûriyeyê wî radestî Tirkiyeyê dike. Bi muebbetê tê cezakirin û niha li Girtîgeha Bafra'yê tê girtin.

**Pirtûkên helbestan yên hatine çap kirin jî ev in:** Raperîna Demsala Min - Abdurrahman Yildirim, Şûnwarê Bîranînan - Fazil Atan, Welatê Min - Medya Yaklav, Berbang Bû Piçûkê Min - Cîhan Azad Aydemîr, Demnarîn - Zeynep Taşgîr. *AMED*

## Apê Mûsa 100 salî ye

Bi boneya salvegera jidayikbûna Apê Mûsa ya 100'emîn, bi bangewaziya rêhevalê wî rojnameger Huseyîn Aykol; Tarik Ziya Ekincî, Ahmet Tellî, Ahmet Turk, Murathan Mungan, Eren Keskîn, Fîkret Başkaya, Îsmaîl Beşikçî, Ayşe Gokkan, Zubeyir Aydar, Halîl Ergun, Sinemxan Bedirxan, Pervîn Buldan, Mazlum Çîmen, Yilmaz Yakut... bi dehan nivîskar, rewşenbîr, hunermend, siyasetmedar, rojnameger, zimanzan û aktîvîstên jin bîranînên xwe yên bi Apê Mûsa re nivîsîn.

Ev bîranîn tev di pirtûka "Apê Mûsa 100 Salî ye" (Apê Mûsa Musa Anter 100 Yaşında) hatin berhevkirin û pirtûk bi edîtoriya Huseyîn Aykol ji hêla Weşanxaneya Aramê ve hat çapkirin.

# Eroglu 'Çerxa Xedar' nivîsand

Romana 'Çerxa Xedar' ku nivîskarê e-rojname Yaşar Eroglu nivîsiye, çap bû. Roman ji 192 rûpelan pêk tê û nivîskar roman bi zaravayê kurmancî yê kurdî nivîsiye.

Nivîskar di romanê de balê dikişîne ser dilsozî û hevaltiya 2 zarokan. Roman bi dilsozî û hevaltiya du zarokan dest pê dike. Di dema zaroktiya xwe de pir ji hev hez dikin û tu car ji hev naqetin. Dema ciwaniya wan rêya wan ji hev diqete, her yek di rêya xwe de diçe. Yek li gund dimîne, bi demê re bi rika yê din dibe cerdevan. Ê mayî dixwîne, diçe tev li refên şervanan dibe, dibe şervan. Piştre tê girtin. Ji vê qonaxê bi şûn de dayika wî ya weke lehengeke esas derdikeve pêş. Roman bi vî awayî dewam dike. Dayik ji kurê xwe pir hez dike. Li derve cerdevan malbatê rihet bernade û neçar dike ji gund bar bikin. Greva birçîbûnê û rojiya mirinê her dem li pêş girtiyan e. Kurê wê jî her dikeve bin vî barî. Hezkirina dayikê û rojiya mirinê dayikê û kurê wê tîne li hember hev. Kurê dayikê bi tercîheke xedar re rû bir û dimîne. Çerxa Xedar romaneke êş, keser, bêbextî û têkoşînê ye. Nivîskar bi zimanekî zelal, balkêş û serkeftî ev mijarên sereke derpêş kirine ji bo xwînerên romanê. AMED



xwebûn

14-20 Îlon 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 39

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** İdris Gürmez
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli

**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Bîr û baweriyên binavbûyî!

Felat Niştiman




Hefteyek berê li ser medyaya civakî hesabekî xebatên destan parve dike, bala min kişand. Bi taybetî dema min kevirên rengomengo yên boyaxkirî dîtin, min di dilê xwe de got ev xebat hêja ne bibin nûçe. Te dî em kurd ên dilnerm ji keviran pir hez dikin! Hema tavilê ez rabûm, min ji wî hesabî re peyam şand.

Nebî beriya min du nûçegihanên din jî lê geriyane ji bo nûçeyê. Wê got, ew niha amadekariya vekirina atolyeyê dike, loma jî bi vekirina atolyeyê re nûçe çêbibe wê baştir be.

Em axivîn û gotinê da ser pişta gotinê… Wexta du kurd biaxivin bi eseyî li gund û eşîrên hev dipirsin, me jî wisa kir. Yek ji min yek ji wê, axaftina me, bi qewlê me farqîniyan xeberdana me, dirêj bû. Her tişta behsa wê kir ez matmayî hiştim. Jiyan û serpêhatiyên vê hevalê bixwe dikarin bibin nûçe. Belkî rojên pêş em behsa jiyana wê ya balkêş jî bikin.

Çi serê we biêşînim! Wê hevalê behsa gundê xwe kir ku di 1999'an de di bin avê de maye. Ev agahî bêtir bala min kişand û kevirên rengomengo dan jibîrkirin lê agahiya nû jî li ser keviran bû; kevirên kêlên miriyan ên di bin avê de!

**Çîroka gundê Deyîkan**

Me biryar da em herin gundê wan û nûçeya wî gundî çêbikin. Du roj şûn de me lêxist em bi hev re çûn gundê wan ê bi navê Deyîkan. Çîrok ji vê pê ve dest pê dike…

Piştî rêwîtiyeke nêzî saetekê ya di nav çiya û dar û beran de, roj li nîvro em gihîştin gundê Deyîkan; gundê Deyîkan yê nû! Wek gelek tiştên welatê me çîrok û serpêhatiyên vî gundî jî 'derasayî' ne.

Em çûn mala dayika Esra Başkalene ku rêbera me berî em biçin, ew agahdar kiribû. Malbat bi kêfxweşî em pêşwazî kirin. Paşê dayika Esra û kurê xwe Evdilqudûs behsa çîroka gundê xwe kirin.

Gundê Deyîkan li çargoşeya naveçeyên Farqîn, Qulp, Qabilcewz (Sason) û Hezoyê ye û bi fermî li ser Farqînê ye. Gund 45 km li bakur-rojhilatê Farqînê dikeve. Mîna bi dehan gundên vê herêmê, di 1999'an de gundê Deyîkana kevn jî di bin ava bendavê de maye; bendeva li ser çemê Batmanê ku yek ji milên çemê Dîcleyê ye. Wê demê 30 malên gund hebûne û gund li peravê çemê Batmanê bûye. Tevahiya gund û derdora 2 hezar donim zeviyên gund jî dikevin binê avê. Berî gund bikeve binê avê gundiyan debara xwe bi titûn, pemû û sewalkariyê kiriye.

Piştî gund dikeve binê avê, gundî berê xwe didin diçin bajarên Amed, Farqîn, Batman, Bismil û Stenbolê. Bi gotina dayika Esra, gundê wan ji hev belewela dibe û her yek ji wan bi cihekî de diçe.

Berî em biçin ser ziyaret û mezelên gund, kurê dayika Esra Evdilqudûs (36) axivî û got ku heta niha tu feydeya ava bendavê ji wan re çênebûye û niha jî tune ye. Evdilqudûs bixwe jî diçe Stenbolê û bi salan li Stenbolê dimîne. Ew 2 sal in hatiye gund û niha debara xwe bi titûn û sewalkariyê dike. Dema em çûn gund jî bi malbatî li bin dilêyê çîlên titûnê çêdikirin.

Evdilqudûs diyar kir ku ji ber ava bendavê pir kêm û zêde dibe ew nikarin avê jê bînin zeviyên xwe yên titûnê û her wiha baxçeyên xwe pê av bidin, loma jî wan ji xwe re sê bîr vedane lê ew jî têrî wan nakin. Wî got ku hem mesrefa anîna ava bendavê zêde ye hem jî ji ber dibe çirav, ew nikarin avê bi hêsanî jê bikişînin nav zeviyên xwe.

**6 mehan bi tenê dimîne**

Gundê Deyîkan di 1993'yan de ji aliyê dewletê ve tê şewitandin û bi darê zorê piraniya gundiyan ji gund tên derxistin. Dema gund tê şewitandin dayika Esra jî li gund e. Wê nexwest bi berfirehî behsa wan rojan bike lê bi israra me tenê ev got; "Dewletê gundê me şewitand. Min ceger kir ez di xaniyê xwe de mam; bi tiqûtenê 6 mehan bi serê xwe mam. Min digot xanî û gundê min heyf in. Ez derketama wê mala min jî bişewitandana."

**Ziyaret jî ketin binê avê**

Li derdora gund 4 ziyaretên bi navên Kalzeynedîn, Meredan, Melhemdan û Pîr Ûsiv ên çêkirina dîroka wan nayê zanîn û mezelên gund hene ku ew jî bi tevahî ketine binê avê. Bi gotina dayika Esra ev her çar ziyaret pir biqîmet in û her sal ji gelek deverên cihê gelek kes tên ser wan; yên 'dîn', yên zarokên wan çênabin û yên derd û kulên wan ên curbicur hene tên ser van ziyaretan.

Ziyaretên Kalzeynedîn, Meredanê havînê bi vekişîna avê re xuya dibin lê Melhemdan û Pîr Ûsiv dernakevin. Havînê gelek kes tên ser van ziyaretan diayan dikin. Dema av bilind dibe kesên tên, li diyarê avê ji wan dûr diayên xwe dikin û diçin.

Dayika Esra da zanîn ku berî gundê wan bikeve binê avê hal û wextê wan baş bûye û wiha got; "Wexta ziyaretên me ketin bin avê dilê me pir êşiya. Ji gund bêtir dilê me bi mirî û ziyaretên me va bû."

Bi dayika Esra re em çûn ser ziyaret û mezelên gund. Ava bendavê vekişiyaye û boz û beyareke berfireh derketiye derve. Li van boz û beyaran ên berê zeviyên gundiyan bûne, niha garanên dewaran û keriyên pez diçêrin lê ji ber her sal av bilind dibe û vedikişe, tu bêjî çêreyeke wisa baş jî lê tune ye. Hinek mezel bi tevahî derketine derve û hinek ji wan jî li nav avê xuya dibin.

**Av avahî ye!**

Gotineke kurdî ya berbelav heye dibêje 'av avahî ye', ango cihê av lê hebe, li wê derê jiyan û afirîneriya civakê heye lê mirov bi çavên serê xwe dibîne ku li vî welatê ji serî heta binî wêrankirî, av avahiyan dadiqurtîne, mirovan birçî dihêle, koçber dike û jiyana wan belawela dike…

## Zemanekî din!

Dema em çûn ser ziyaretê wisa li min hat ku wek em li zemanekî din bin; mezelên li nav avê, darên hişk ên hê jî li piya ne, kêlên mezelan ên li wan rastan belavbûyî, çêlekên zeyîf ên li nav mezelan mexelhatî… Te digot qey em di tabloyeke surrealîst de ne; ma jixwe bi salan e welatê me ne di rewşeke surrealîst de ye! Bi kurt û kurmancî dîtin û gotin nabin yek!

Loma jî piştî van dîmenan mirov baş têdigihîje ku bi bendavan tenê xweza nayê tunekirin an jî armancên siyasî pêk nayên, her wiha bîr û baweriyên civakê, çand û kevneşopiyên wê, aborî û civakbûna wê jî wenda dibin diçin…

Roj li ber ava bi xemgînî û bi giraniya rastiya parçebûyî, me berê xwe da Farqînê em hatin malê; li dû me siya çîrokên nîvcomayî û heta tu bêjî bes çewisandî…



